


## Dewleta laşxwir

Di civîna bilind a li Dohaya paytexta Qeterê ku 16ê kanûna 2025an pêk hat, Tirkiye nehat vexwendin. Zedetirî 45 welat beşdarî vê civînê bûn û ev welatan hemû wê di nav hêzên aramkirina Xezayê de cihê xwe bigirin, lê Tirkiye tê de nîn e... *Ahmet Aktaş/R.8*



## 'Sosyalîzma' Stalîn

Têgiha "sosyalîzm li welatekî", ku di dawiyê de ji hêla Stalîn ve di salên 1924-1926an de piştî mirina Lenîn û têkoşîna bi Trotsky re hat formulekirin; ne tenê avahiyek teorîk bû, lê bersivek pratîkî bû ji bo dijwariyên demê... *Kurdistan Lezgiyeva/R.7*



## Gefên Tirkiyeyê û rastiya qadê

Rojava û Sûriye ketin pêvajoyeke nû. Di serî de hemû hêzên siyasî divê gelê kurd piştgiriyê bide Rojava. Ji bo zêdetrî statû û mafan kî li ku derê bibe bila bibe, çi ji dest tê divê bike. Roj roja xwedîderketina li Rojava û misogerkirina... *H.Halît Alaçatî/R.6*


*22 - 28 Kanûn 2025*
*Hejmar:* 314
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

xwebûn

xwenasîn e


# Daxwaz aştiyek bi rûmet e

Veysî Aktaş û Çetîn Arkaş ên ku piştî dîlgirtina 30 salan hatin berdan niha ji bo pêkanîna Banga Aştî û Civaka Demokrat îk daxwaz û pêşniyarên gel guhdar dikin. Gel fikarên xwe ên der barê rewşa Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan de tînin ziman

Gulistan Sonuk a ku bi Veysî Aktaş û Mazlûm Dînç re tev li civînan dibe got: "Rêber Ocalan ji bo bangawaziya xwe ya dîrokî ya Manîfestoya Aşitî û Civaka Demokratîk gotibû: "Yê ku vê manîfestoyê jiyanî bike gel bixwe ye." Ji ber vê yekê jî em bi gel re manîfestoyê nîqaş dikin. Sedema xwe jî ev e; nexşerêya vê pêvajoyê ya herdu aliyan jî manîfesto ye. Di manîfestoyê de hem peywirên ji bo gel hene, hem jî ji bo dewletê. Heger rojek beriya rojekê herdu alî jî peywira xwe binîn cih, wê pêvajo zû bi pêş bikeve û aloziyên pêşiya pêvajoyê ji holê rabin. Sedemeke van civênan yek jî ev e ku; di serê gelê kurd de hin pirs hene divê bên zelal kirin. Bêguman sedema vê jî nêzîkatiya rayedarên dewletê û bikaranîna zimanê şerê taybet e."



Gulistan Sonuk di axaftina xwe de da zanîn ku gumanên gel ji pêvajoyê h ene û wiha got: "Hêviya civakê a ji bo pêşerojek bi hev re û aştiyek birûmet zêde kir. Ji aliyê din ve jî, pêşî li ber siyaseta şer hat girtin û pêşiya rê û rêbazên nîqaşkirina siyaseta radîqal a demokratîk hat vekirin. Rêbertiyê bi bangawaziya 27ê sibatê ne tenê bang li PKKê kir, hemû amûrên qirqirinê yên desthilatdariyê jî ji destê wan derxistin û rê li ber çalakiyên gel ên demokratîk vekir. Ew kesên ku di çaresernekirina pirsgirêka kurdî de israr dikirin û çek wek hincet didîtin, piştî bangawaziya Rêber Abdullah Ocalan, polîtîkayên dewletê yên şerê taybet pûç bûn. Bi vî awayî pêşî li şer û mirinê jî hat girt. Nêzîkî salekê ye ji ber şer kes namire û nayên girtin... *Hevpeyvîna Xecê Şen/R.4*

## Gurgum ra heta Sûrîye

Tarîxê merdimayîye de tayê rojî estê ke, ê rojî tenya teqwîm de yew hûmare nîyê; ê rojî nîşanê dejî, şînî û birînanê xorînan ê. 19ê Kanûna 1978î zî tarîxê kurdan û elewîyan de rojêka winayîn a. Na roje, destpêkê Qirkerdişê Gurgumî/Mereş ya. Labelê no qirkerdiş, tenya serebûtêko tarîxî nîyo; no zîhnîyet ewro zî cografyaya Rojhelatê Mîyanênî de, xusûsen Sûrîye de ganî yo û vera komelê elewîyan de gefanê girdan waneno. Sûrîye de elewîyî, seke Gurgum de ameyê dorpêç kerdene, ewro zî binê dorpêçêka girdî de yê. Tirsa înan a tewr girde a ya ke, senî ke Gurgum de cîranî cîranê xo kişt, Sûrîye de zî eynî felaket biqewimîyo. Elewîyê ke ewro cîhan de yê, ganî nêbê bêveng vera zulmê ke Sûrîye de yeno kerdene. Elewîyê kirmancî/zazayî, kurmancî û tirkî, ganî dest bidê yewbînan û vera nê zîhnîyetê "faşîstî" de yewbîyayîşê xo xurt bikerê. Çike êyê ke ewro Sûrîye de serebirnenê, eke firsend bibînê, do eynî çî Gurgum de, Dêrsim de, Meletî de Erzîngan de zî bikerê. Nê hêzê tarîyî wazenê ke cografyaya Rojhelatê Mîyanênî ra renganê cîyayan û kulturê cîya-cîwîyayîş awan bikerê. 19ê Kanûne de vîrardişê Qirkerdişê Gurgumî, tenya yadkerdişê merdiman nîyo... *R.9*

## Hêrs ne bes e, rêxistinbûn şert e!

Avakirina komîteyên parastina taxan ango xwe rêxistinkirin yek ji hîmên herî sereke yê li dijî her cure êrîşan in ku li ser civakê tên ferzkirin. Em nikarin li benda polîs an dadgehên dewletê bin ku me biparêzin, ji ber ku ew bixwe amûrên vî şerî ne. Ew bixwe şerê taybet li Kurdistanê rewa dikin. Ciwan divê li taxên xwe tîmîn şopandinê ava bikin. Divê têketin û derketina kesên biguman di bin çavdêriya ciwanan de be. Malbatên ku zarokên wan ketine xefka tiryakê, divê tenê neyên hiştin. Divê li her taxê komîteyên piştgiriyê werin avakirin da ku wan ciwanan ji nû ve qezenc bikin. Siberoja xweş a Kurdistanê ne bi hovîtiya dewletê, bi vîn û xebata ciwanên serhildêr dê bê avakirin. Parastina cewherî ne tenê hilgirtina çekê; ew hilgirtina rûmetê, parastina hevalê xwe û xwedîderketina li dar û devî û berên çiyayên me ye. Dem dema wê ye ku em ji vê xewa giran şiyar bibin. Şerê taybet tenê bi rûmeteke bilind û bi rêxistinkirineke herêmî û radîkal tê têkbirin. Divê her mal û tax bibe keleha berxwedanê. Divê em li hemberî talankerên sirûştê û kujerên civakê bibin yek hêz. Yan em ê bi rûmet li axa xwe û nirxên xwe xwedî derkevin, yan jî em ê di bin vê heriya qirêj a dewletê de wenda bibin. Hêrs ne bes e, rêxistinbûn şert e!.. *Felemez Ülüğ/R.6*




## 'Divê azadiya fizîkî êdî pêk bê'

Platforma Saziyên Demokratîk a Amedê dê, 4ê çileya 2026an, li Amedê bi dirûşma "Hêvî û azadiyê" mitîngekê li dar bixe. Endamê Komîteya Amadekar a Mitînga 4ê çileyê, Bedirxan Çetînkaya der barê mijarê de got: "Ji bo pêvoja nexitime, gava herî girîng dayîna mafê hêviyê û azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Eger azadiya fizîkî pêk neyê, dê pêvajo bixitime. Em dixwazin gelên li Tirkiye û Kurdistanê bi hev re bijîn. Ji bo azadiya fizîkî û mafê hêviyê pêk bê, em Platforma Saziyên Demokratîk ên li Amedê, em ê 4ê çileyê mitîngê li dar dixin. Em bang li hemû gelê xwe dikin ku beşdarî mitîngê bibin." *R.3*

## Sînemageran anîn gel hev

Li Amedê di navbera 7 û 14ê kanûnê de 3yemîn Mihrîcana Fîlman a Amedê ya Navnetewî hate lidarxistin. Mihrîcan bi kedeke mezin û organîzatoryeke hêja ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û saziya sînemayê Sînebîrê ve bi televîbûna bi dehan belgefîlm û fîlmên metrajdirêj li Navenda ÇandAmedê û salona sînemayê ya Ceylanlarê hatin pêşandan. Tiştekî din ê girîngî û cudatiya vê mihrîcana îsal ji yên berê ew bû ku cara yekem e fîlmên kurdî li salona sînemaya navendeke mezin a danûstandinê hatin nîşandan. Ji naverok... *Rizoyê Xerzî/R.11*

## Ji rêya xwe neqetiyan

Salek berê bû, 19ê kanûna 2024an, lê mîna demjimêrek tenê di ser kêliya bihîstina bûyerê re derbas bûbe ku dilê bi sedan dayik û xwişkên hevrêyên me Cîhan Bilgîn û Nazim Daştan şewitî. Cîhan a ji bakurê Kurdistanê dest bi rojnamgeriyê kir, li Rojava bi belgekirina şoreşê ji êrîşan heta avakirinê dîrokek tijî li pey xwe hişt. Cîhan ne tenê şahidî li Şoreşa Rojava kir; şoreş ji dil bi hemû kêliyên wê ve jiya. Ji êrîşên li ser pergala demokrasiya ku xwe dispêre azadiya jinan tê avakirin heta avakirina komunekê... *Sorgul Şêxo/R.2*

# Esmera deşta Mêrdînê şopdara Gurbetellî Ersoz

Cîhan ne tenê şahidî li Şoreşa Rojava kir; şoreş ji dil bi hemû kêliyên wê ve jiya. Ji êrişên li ser pergala demokrasiya ku xwe dispêre azadiya jinan tê avakirin heta avakirina komunekê, serdana mizgeft û vêxistina mûmekê li dêreke xiristiyanan...



Sorgul Şêxo



Esmera deşta Mêrdînê a ku bi Şoreşa Rojava re kêlî bi kêlî meşiya û şoreş ji dil jiya.

Salek berê bû, 19ê kanûna 2024an, lê mîna demjimêrek tenê di ser kêliya bihîstina bûyerê re derbas bûbe ku dilê bi sedan dayik û xwişkên hevrêya me Cîhan Bîlgînê şewitî. Cîhan a ji bakurê Kurdistanê dest bi rojnamgeriyê kir, li Rojava bi belgekirina şoreşê ji êrişan heta avakirinê dîrokek tijî li pey xwe hişt. Cîhan ne tenê şahidî li Şoreşa Rojava kir; şoreş ji dil bi hemû kêliyên wê ve jiya. Ji êrişên li ser pergala demokrasiya ku xwe dispêre azadiya jinan tê avakirin heta avakirina komunekê, serdana mizgeft û vêxistina mûmekê li dêreke xiristiyanan... Cîhanê ev kêlî tev ji dil dijiya, hez dikir û parve dikirin. Ne tenê ji hêla jin û gelê kurd ve dihat hezkirin, li Rojava dayikên ermen, suryan, aşûr û ereb jî Cîhan wekî keça xwe didît. Cihê ku Cîhan lê bû kombûyîn hebû, parvekirina geşedanên dawî û agahdarkirina malbatan wek erka xwe didît. Ne tenê li paş kamerayê li pêş kamerayê û di nav malbatan de jî rojnamegerî dikir û agahî rast digihand xwendevan û malbatan.

**Rojnamegerek bi xusletên parêzerekê**

Cîhan ne tenê bi nûçeyan tundiya li dijî jinan belge dikir, lê di serdana malbatan de jî gava ku hevjîn an jî kur tundiya devkî li dayika xwe dikir, Cîhan yekser destwerdana rewşê dikir û ew dayik diparast û xwedî helwest bû. Her çiqas Cîhan rojnamger bû lê bi xusletên parêzerekê tevdigeriya û ev di meş û gotinên wê de pir diyar bû. Derûniya her kesê/î analîz dikir û li gorî wê danûstandin dikirin, bi wê başiya xwe dikarîbû mirovên li dora xwe biguherîne. Mîna derûnnasekê bi kenê xwe jiyan diherikand, mîna çemekî zanebûna wê her diherikî. Hem miroveke baş bû û hem jî dilpola bû.

Şehadeta wê bandor li giştî Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê kir. Her çiqas dewleta tirk a dagirker wê qetilkiribe jî lê belê xwedîderketina neteweyan jê re ew qeyd û bend û sînor derbas kirin û giyanê wê her dan û didin jiyîn. Cîhan bîra rojnamger û gelên Rojava ye, ev bîr her zindî ye û nayê jibîrkirin. Ji ber ku Cîhan xwe nedida jibîrkirin, rûniştinek wê dîsa bandora xwe demdirêj li ser mirov dihişt. Şopa wê li her gund, bajar, kolan û taxek li Rojava bi bîranîn û kenê wê tijî û zindî ye. Em li ku dimeşin, bîranînên me û kenê me bi hev re hen ku di kêliyên herî zor de me parve dikirin.

Hevrêya me xwedî pêşbîniyên pir bi hêz bû. Beriya ku bûyerek biqewimiya wê ji kûr ve hîs dikir, amadekarî ji ragihandina wê ji raya giştî re dikir. Di hevdîtinên me yên dawî de pir bi kelecan bû, bi dilekî tijî hêvî xebat dida meşandin. Hêza xwe ji dîtina xewnên Rêber Apo û ji agahiyên ku êdî wê hevdîtin pê re bihata çêkirin, digirt. Hêvî, kelecan û moralek ne normal dijiya û bi derdora xwe re jî par ve dikir. Ji ber mijara wê ya sereke hem di jiyanê de û hem jî di xebata xwe de azadiya fizîkî a Rêber Apo bû. Ji gotinên wê yên dawî "Agahiyên xweş hene''.

**Hestên Aştî û Civaka Demokratîk**

Xwezî îro Cîhan hebûya û agahiyên ku ji Rêber Abdullah Ocalan tên bihîstiba; xwezî wê ev kêlî bijiya. Ger em rastir bêjin wê wiha be: Cîhan beriya ku were hedefgirtin hestên pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji dil dijiya. Baweriya wê bi Rêbertiyê hebû ku wê bi rewşenbîriya xwe kurdan ji komkujî û qirkirinan xilas bike. Digot, niha erê êrişên dijwar hene lê sibehên ronak li benda me ne. Lê xwezî îro ew jî hebûya ku di nav sala jê bar kirî de çiqas bûyer hatin jiyîn û mizgînî hatin bihîstin. Xwezî ewqas agahî û wêneyê Rêber Apo ku bi salan bi hesreta wê çav li rê ma, bidîta û bibihîsta. Xwezî kêliyên dîrokî bijiya. Bi hesreta dîtinê çû. Hemû kêfxweşiyên tên jiyîn bêyî wê kêm in.

Cîhan mîrateyek e ji me re, hezkirineke xwe ya bêdawî di dilê her jinekê de çand, kenê xwe di bîra her dayikekê de hişt, nûçe û dosyeyên çêkirî çîrok û dîroka Şoreşa Rojava bi gelek netewe û aliyên Kurdistan û Rojhilata Navîn da xwendin û guhdarîkirin. Paşperdeya bûyeran analîz û belge dikir. Wiha bû her di nav lêkolînan de bû, koka pergala ku li dijî gel û neteweyan qirkirin û komkujiyan pêk tîne wê teşhîr dikir. Koka bûyerê derdixist û kujer bi cîhanê dida nasîn. Ne tenê êrişên li dijî kurdan li dijî ermen û suryanan jî belge dikirin. Kujerê gelan yek bû û Cîhan xwest wî kujerî bi belgeyan bide nasîn.

Nehiştin cara dawî wê hilm bike Kujerên wê nehiştin darbesta wê derbasî bakurê Kurdistanê bibe, da ku dayika wê cara dawî piştî dûrketina 8 salan wê bêhn bike, hembêz bike, destê xwe careke din di ser porê wê yê reş û dirêj re bibe û bigire hilm bike. Dagirkeriya tirk nehişt darbesta wê derbasî bakurê welêt bibe û dayika wê cara dawî wê bibîne û aliyek din jî hevrêyên wê û gelê xwedî lê derdiket xistin girtîgehê û ceza li wan birî.

**Cîhan navdar bû lê tirk?**

Lê dagirkeriya tirk bi bin ket, ji ber xwedîderketina li Cîhan Bîlgînê ji terora wî mezintir bû. Cîhan bêhtir hat nasîn û bi dehan Cîhan ên li ser şopa wê ne, Cîhanên nû çavên xwe li dinyayê vedikin wê hebin, lê dewleta tirk? Kîn û hêrsa li hember dagirkeriyê xurtir bû, bêhtir hat zanîn ku zeyîftiyên dagirkeriyê çi ne û di kur de ye û em ê çawa bikaribin hovîtî û terora wê zêdetir aşkera bikin.

**Ji rêya xwe neqetiya**

Cîhan a ku her rastî gefên dagirkeriya tirk dihat, ji rêya xwe û refê xwe neqetiya û dest ji meşa ber bi heqîqetê ve berneda. Şehadeta wê jî vê yekê piştrast dike. Hemû hewldanên dagirkeriya tirk a gefxwarina li ser jiyana wê têk çûn. Cîhan mezintir bû, çîroka Cîhanê ji her kesî re tê gotin, bi hezaran kes Cîhan nas kir û îro zarokên nû tên dinyayê jî navê wê radikin. Îro gelek Cîhanên din hene li pey heqîqetê dibezin û li ser şopa Cîhan Bîlgînê ne ku ew bû şopdara Gurbetellî Ersozê.

**Para wê di şoreşê de heye**

Rojek min xeyal nedikir wê Cîhan biçe û ez ê bimînim û li ser şehadeta wê binivîsim û qala wê bikim. Şehadeta wê biêş e lê em ji rêya wê neqetiyan û naqetin. Rêya Cîhanê rêya me ye, kamereya wê hîn çîrokên şervanan û jinan belge dike û şoreşê dide nasîn. Para Cîhanê di Şoreşa Rojava de heye. Cîhan bû parçeyek ji Şoreşa ku her dem digot, 'Ev Şoreş heq dike mirov nirx bidê' û di nivîsandina dîroka Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de Cîhan xwedî parek mezin e.

# Çareserî Sûriyeya 'nenavedî' ye

Rolyana Ahmed

Kesî texmîn nedikir ku di nav çend rojan de rejîma Baasê hilweşe ku bi dehan sal in li ser desthilatê bû. Bêyî şer û pevçûn û berdêl HTŞ hat desthilata Sûriyeyê bi dest xist. Di çend kêliyan de rewşa Sûriyeyê tev guhert û tevahî baregeh û cihên hikûmeta Baasê xist bin kontrola xwe. Her wiha sîstemeke li gor xwe, sîstem û destûreke îslamîst a radîkal saz kir; li ser bingeha yek dewlet, yek ol, yek reng û yek zimanî.

Gelo ka em bipirsin, 13 sal bûn rejîma Baasê li dijî opozîsiyonê şer dikir, em dikarin bêjin ku HTŞê hikûmeta Baasê di çend rojan de hilweşand?

Hêjayî gotinê ye ku em dikarin bêjin li paş van bûyeran hêza Îsraîlê heye. Ji bo Îsraîlê hilweşandina Baasê ne di asteke pir girîng de bû. Îsraîlê dixwest lingên Îranê ji Sûriye û Libnanê bibire. Wê siyaseta xwe pê kanî bi peymanên veşarî di navbera Îsraîl û Colaniyê berê Şarayê niha de.

Îsraîlê xwest kevirekî li du çûkan bide. Çûka yekemîn Îran û ya duyemîn sîstema Ahmed Şara ye. Piştî ku Îsraîl hemû rê û rêbazên xwe bi cih bîne, wê karîdora Dawûd û axa Colanê bi dest bixe. Piştre wê çûka duyemîn bêwate û bêqîmet bihêle, yanî hebûn û nebûna Ahmed Şara wek hev wê bimîne ango mirin wê jê re baştir be.

Di van bûyerên tevlihev de Tirkiyeyê xwest serweriyê li ser hemû axa Sûriyeyê bike û heta demekê hemû biryarên hikûmeta nû bi xwe ve girêda. Her wiha wê xwest peymana xwe ya millî (mîsaqî millî) dubare bike û Sûriyeyê ji xwe re bike mîna parêzgehekê. Li vir Îsraîlê dewleta tirk li Sûriyeyê ji xwe re xeter dît. Ew bêhelwest nema û hemû baregehên ku Tirkiyeyê dixwest li Sûriyeyê bi cih bike, kirin aramanc û ew tune kirin. Ev peyamên şênber bûn ji bo ku Tirkiye xwe nêzî sînorên Sûriyeyê neke û nebe xeterî ji Îsraîl re û li ber planên wê yên siberojê.



Di ser hilweşandina rejîma Baasê re salek derbas bû û ti aramî pêk nehat li Sûriye û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Pêwîst bû ku Ahmed Şara ku wek serokê hikûmeta demkî ya Sûriyeyê tê naskirin, di siyaseta xwe de girîngî bida hundirê welêt da ku pergaleke demokratîk pêk bianiya, hemû pêkhate hembêz bikirana û pergaleke pirreng saz bikira. Ev xebat wê ji guhdarîkirina dewletên derve çêtir bûya. Di pirsgirêkên hundirîn de fetisî û siyaseta xwe li hember pêkhateyên Sûriyeyê şaş meşand û heman şaşitî û kêmasiyên pergala Baasê dubare kirin û hema bêje jê xirabtir jî bû.

Piştî hilweşidina Baasê rewşa Sûriyeyê her ku çû xirabtir bû. Her wiha di vê demê de dewletên hegemon li rewşa Sûriyeyê bi çavekî tirsnak meyzand û wan xwest ku vê rewşê sererast bikin. Piştî bûyerên beravê û durziyan xwestin bi rêya HSDê vê rewşê biguherînin. Di wê demê de peymana 10ê adarê di navbera general Mazlûm Ebdî û Ahmed Şara de hat îmzekirin. Şara nikaribû pêkhateyên Sûriyeyê bîne gel hev û ji ber vê jî dewletên derve xwest ji tecrûbeyên HSDê û rêveberiya xweser sûdê werbigirin da ku li Sûriyeyê pergeleke tekûz bê sazkirin.

Ji ber vê ger em peymana 10ê adarê bixwînin em ê baştir têbigihîjin. Bi tecrûbeyên rêveberiya xweser dikare pergaleke demokrat û pirreng bê avrkirin ku tevahiya pêkhate xwe di nav de bibînin.

Ji bo vê jî dewletên hegemon dîtin ku Sûriye bi pergaleke navendî nikare bê birêvebirin û fêhm kirin ku pêwîst e pergaleke nenavendî ya bi rengê federalîmê bê sazkirin.

Em dikarin zelaltir bêjin ku ji bilî nenavendîbûnê ti çareseriyeke guncav nîne ji gelên Sûriyeyê re û diyar e ku Sûriye ber bi avakirina pergaleke nenavendî ve diçe û wê bi ser jî bikeve.

# Ji bo azadiya fizîkî mitîngê li dar dixin

**Bedirxan Çetînkaya der barê mîtînga 4ê çileyê de got:"Divê dewlet rola xwe bilîze. Ku rola xwe pêk neyne dê pêvajo bixitime. Ji bo ev nebe, gava herî girîng dayîna mafê hêviyê û azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e."**

Navenda Nûçeyan

Platforma Saziyên Demokratîk a Amedê dê, 4ê çileya 2026an, li Amedê bi dirûşma "Hêvî û azadiyê" mitîngekê li dar bixe. Di mitîngê de dê azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê xwestin. Platformê ji bo mitîngê, 17ê kanûnê, daxuyaniyek da. Nûnerên partiyên siyasî û rêxistinên civakî beşdarî daxuyaniyê bûn. Têkildarî armanca mitîngê û xebaten mitîngê Endamê Komîteya Amadekar a Mitînga 4ê çileyê, Bedirxan Çetînkaya nirxandin kirin.

Bedirxan Çetînkaya anî ziman ku Platforma Saziyên Demokratîk ên Amedê ku di nav de DBP, DEM Partî, TJA, Meclisa Ciwanan û tevahiya rêxistinên sivîl û civakî yên Amedê hene dê 4ê çileyê, li qada Îstasyonê ya Amedê mitîngekê pêk bîne û wiha got: "Em ê ji bo azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan mitîngê li dar bixin. Em bi biryar in wê rojê mitîngek bi coş, kelecan û heybet li dar bixin. Di pêvajoya 52 salan de gelek caran hewldanên çareseriyê bi pêş ketin. Lê her tim hatin astengkirin. Li dijî çareseriyê




her tim polîtîkayên desthilatê yên bêçareseriyê derketin pêş. Van astengiyên li pêşiya çareseriya kurdî, her tim pirsgirêka gelê kurd kûr kir. Ev pirsgirêk êdî ne tenê herêmî ye, bûye pirsgirêkek gerdûnî û hemû cîhanê eleqedar dike. Ji ber van polîtîkayên şer û înkarê, gelê li Rojhilata Navîn êş û kederên gelek mezin jiyane."

Endamê Komîteya Amadekar a Mitîngê Bedirxan Çetînkaya, anî ziman ku piştî banga dîrokî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li meclisê komîsyon hat avakirin û wiha axivî: "Komîsyona meclisê ji bo çareseriyê li nûnerên partiyên siyasî, komele, saziyên civakî, rêxistinên demokratîk û hemû beşên civakê guhdarî kirin. Piştî hevdîtinên bi nûnerên sazî û partiyan re şandeya Komîsyona Meclisê 24ê mijdarê çû girava Îmraliyê. Bi vê hevdîtina li Îmraliyê pêvajoya krîtîk li pey xwe hişt."

Bedirxan Çetînkaya da zanîn ku sed sal in çand, ziman û nasnameya gel tê înkarkirin û wiha berdewam kir: "Vê polîtîkaya qirêj a Tirkiyeyê ne tenê li ser gelê kurd, li ser hemû gelên Tirkiyeyê rûxandinek mezin ava kiriye. Bi van polîtîkayan gel heviya siberojê wenda kir. Nasnameya xwe wenda kir û bê nefes ma. Bê ziman, nasname, çand, bîr û hiş ma. Li dijî van polîtîkayên qirêj 52 salan şerekî dijwar hat meşandin."

Bedirxan Çetinkaya, bi bîr xist ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî ku 27ê sibatê banga Aştî û Civaka Demokratîk kir, PKKê kongreya xwe pêk anî û xwe fesix kir û wiha berdewam kir: "Piştî şerê 52 salan dewletê êdî hebûna gelê kurd qebûl kir. Piştî hebûna gelê kurd qebûl bû, PKKê xwe fesix kir."

Bedirxan Çetînkaya, herî dawî destnîşan kir ku pêvajo hatiye asteke nû û wiha got: "Divê êdî dewlet rola xwe bilîze. Ku dewlet erka xwe pêk neyne dê pêvajo bixitime. Em naxwazin pêvajo bixetime. Ji bo pêvoja nexitime, gava herî girîng dayîna mafê hêviyê û azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Eger azadiya fizîkî pêk neyê, dê pêvajo bixitime. Em dixwazin gelên li Tirkiye û Kurdistanê bi hev re bijîn. Ji bo azadiya iîzîkî û mafê hêviyê pêk bê, em Platforma Saziyên Demokratîk ên li Amedê, em ê 4ê çileyê mitîngê li dar dixin. Em bang li hemû gelê xwe dikin ku beşdarî mitîngê bibin. Em ê, 4ê çileyê, li qada Îstasyonê ya Amedê mitînga dirokî pêk bînin. Ji bo azadiya fizîkî ya Rêbê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û demokratîkbûna tevahiya Tirkiyeyê werin em bi hev re beşdarî vê mitîngê bibin. Em hemû gelê kurd li dora Rêber Abdullah Ocalan kom bibin û aştiyê mîsoger bikin. Heta azadiya fizîkî ya Rêber Ocalan pêk neyê gel jî azad nabe. Ji bo pêvajo bigihîje serkeftinê divê azadiya fizîkî pêk bê. Em dixwazin hemû gelê Amedê bi coş û kelecanek mezin beşdarî mitînê bibe."


# Penaberî sal bi sal zêde dibe

Zafer Pîran

Li gorî Komîseriya Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî, heta dawiya nîsana 2025an li tevahiya cîhanê 122,1 milyon mirovan bi zorê ji cih û warên xwe koç kiriye. Li gorî daxuyaniyê tê ditin ku her ku diçe hejmara penaberan zêde dibe. Endama Lijneya Rêveber a Navenda ÎHDê Gulseren Yolerî, anî ziman ku sedema vê zêdebûna koçberiyê, şer, xizanî û talankirina xwezayê ye û wiha got: "Kes û hêzên ji bo berjewendiyên xwe yên zêde û berjewendiyên dewletê bêhtir pêşiya koçberiyê vedikin. Dewlet ji bo berjewendiyên xwe li dijî koçberiyê erk û berpirsyariyê nadin ser xwe. Ev jî dibe sedem ku êş û jariya mirovan zêde bibe."

Gulseren Yolerî da zanîn ku Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewropayê jî tevî ku li ser esasê parastina mafên mirovan, aştî û demokrasiyê hatine avakirin jî, îro ev armancên xwe dane rawestandin û wiha berdewam kir: "Bi îmzekirina peymana mafên mirovan, divê mafê starê û mafên bingehîn ên mirovan biparêzin. Lê tevî ku peyman îmze kirine jî vê peymanê binpê dikin. Hemû welatên cîhanê mafê stara mirovan binpê dikin. Li ser navê 'parastina sînoran' tedbîrên taybet werdigirin û deriyê xwe li penaberan digirin. Li ser sînorên welatên xwe têlên bikelem û dîwarên bilind ava dikin. Dîsa îşkenceyê li penaberan dikin û wan ji sînorên xwe dûr dixin. Bi hinceta ewlehiyê van binpêkirinên mafan rewa nîşan didin."

Gulseren Yolerî destnîşan kir ku penaberên derbasî sînorên welatên din dibin, bi kiryarên ku mirovan poşman dikin re rû bi rû dimînin wiha lê zêde kir: "Dewlet, şertên xerab ên li kampan, mayîna dirêj a penaberan a li kampan û dersînorkirina li dijî hiqûqê rewa dibînin. Îmzekirina peymana qebûlkirina paşvevegerandinê ya penaberan binpêkirina mafên penaberan zêde dike. Li Tirkiyeyê ev helwesta neyînî zêde li pêş e. Piştî 2013an cudakariya di navbera penaberan zêde bû. Ji bo penaberên ku ji Sûriyeyê hatin, bi demkî statuya parastinê hat dayîn. Lê mafê parastina navneteweyî nehat dayîn. Penaberên ji welatên din hatin jî li derveyî statuya parastina demkî hatin girtin. Mafê wan ê parastina navneteweyî



hat sînordarkirin. Penaberên qeydên wan hene û qeydên wan tune ne, ji hev hatin cudakirin. Mafên ku dabûn penaberên Sûriyeyê yek bi yek ji destê wan hatin wergirtin. Îro penaberên ji Sûriye hatine Tirkiyeyê nikarin sûdê ji mafê perwerdehî û tenduristiyê werbigirin. Eger pereyên wan hebin dikarin biçin nexweşxaneyan. Ji bo wan êdî li Tirkiyeyê jiyan pir zor e. Penaberên bêqeyd nikarin ji tî mafên xwe yên penaberiyê sûdê werbigirin. Komên penaberan rastî êrişên nijadî tên, keda wan tê xwarin û wekî dijmin tên dîtin. Rastî tundî, tacîz û tecawizê tên. Penaberên ji ber şer hatine, li vir neçarî jiyana herî xerab tên hiştin."

Guleren Yolerî herî dawî da zanîn ku hejmara penaberên qeyda wan heye tên zanîn, lê penaberên ku qeyda wan tune ye nayên zanîn û wiha axivî: "Di civîna nîsana 2025an de Tayyîp Erdogan axivîbû. Li gorî daxuyaniya wî, li Tirkiyeyê 2 milyon û 768 hezar sûriyeyî hene ku statuya parastina demkî wergirtine. Dîsa 1 milyon û 90 hezar kes hene ku bi destûra mayînê dimînin. 176 hezar penaber jî bi destûra parastina navneteweyî hene. Bi giştî 4 milyon û 33 hezar penaber li Tirkiyeyê hene. Di 2 salên dawî de 270 hezar penaber li ser sînorên Tirkiyeyê hatin astengkirin. Ji wan 263 hezar kes hatin dersînorkirin. Ji 9ê kanûna 2024an heta niha, kesên ji Tirkiyeyê vegeriyan Sûriyeyê gihîşt 200 hezar kesî. Hejmara penaberên vegeriyan welatên xwe jî gihîşt 931 hezar û 450 kesî."

# Garantiya hiqûqî şert e

Xecê Şen

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 27ê sibatê, banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ji dewletê jî xwest ku gavên siyasî û hiqûqî biavêje. Dîsa bang li hemû saziyên civakî, tevgerên jinan û saziyên hiqûqî kir û xwest ku erka xwe pêk bînin. Her wiha Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) li ser banga rêberê xwe, Reberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, kongreya xwe pêk anî û xwe fesix kir. Komeke gerîlayên, 11ê tîrmehê, bi merasîmekê bi awayekî sembolîk çekên xwe şewitandin. Dîsa PKKê, 26ê cotmehê, bi daxuyaniyeke çapemeniyê ragihand ku wan hêzên xwe ji Tirkiyeyê vekişandine. Li aliyê din, 5ê tebaxê, li meclisê Komîsyona Meclisê hat avakirin. Vê komîsyonê demeke dirêj li nûnerên sazî, partî û komeleyan guhdarî kirin. Niha jî komîsyon raporên xwe pêşkêşî meclisê dike.

Baroya Amedê jî, li ser bingeha rêbazên demokratîk û aştiyane çareserkirina pirsgirêka kurdî û pêkanîna qanûnên navneteweyî, aştiya civakî, serweriya mafên siyasî û hiqûqî, qanûna wekhevî, edalet, azadîxwaziyê, 27ê cotmehê, 'Entegrasyona Civakî û Beşdariya li Aştiyê' komîsyonek ava kir.

Endamê Komîsyona Entegrasyona Civakî û Beşdariya li Aştiyê parêzer Diyar Çetedîr, li ser armanca komîsyonê û mafê hêviyê nirxandin kirin. Prz. Diyar Çetedîr, bal kişand ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a Aştî û Civaka Demokratîk û got: "Divê biryara mafê hêviyê yê Birêz Ocalan demildest bê dayîn. Wî pêvajoyeya aştî û çareseriya demokratîk da destpêkirin. Ev pêvajo ji bo azadiya Abdullah Ocalan, demokratîkbûna Tirkiyeyê û ji bo Rojhilata Navîn şanseke mezin e. Zêdetirî 40 sal in şer didome. Ev şer bû sedem ku li Tirkiye û Rojhilata Navîn kuştinên kujernediyar û binpêkirinên mafan zêde bibin; bû sedema koçberiya bizorê, kuştina jin û zarokan; bu sedema qeyrana aboriya civakê."

Parêzer Diyar Çetedîr bal kişand ser xebatên Baroya Amedê jî û wiha lê zêde kir: "Baroya Amedê 40 sal in şahidê vî şerî û vê tundiyê ye. Heta niha li dijî şer têkoşiyaye û dê ji niha û şûnde jî li dijî şer, kuştin û binpêkirina mafan têbikoşe. Em wekî Baroya Amedê hêza xwe ji parêzvaniya mafan werdigirin. Ji bo ku aştiyek mayinde pêk bê, wek saziyeke hiqûqê, ji bo hiqûqa demokratîk gotina me heye. Lewma me, 27ê cotmehê, 'Komîsyona Entegrasyona Civakî û Beşdariya Aştiyê' ava kir. Me jî, ji bo ku aliyên hiqûqî, civakî, çandî û siyasî baş bi rê ve biçin, dest bi xebatên "Entegrasyona Civakî û Beşdariya li Aştiyê" kir. Ji bo guherînên qanûnî fikir û pêşniyarên me hene. Em ê pêşniyarên qanûnan amade bikin û bi raya giştî re parve bikin. Tecrûbeyên cîhanê nîşanî me daye ku pêvajoyên aştiyê çiqas zehmet û hestiyar derbas dibin. Ji bo aştiyê divê pîvanên hiqûqê hebin. Kesên ku pêvajoyê bi rê ve dibin, divê ji aliyê hiqûq û zagonan ve bên parastin. Ku qanûn neyên avakirin dê mîlîtanên rêxistinê çawa bikaribin bi ewle xebatên xwe bikin û xwe biparêzin. Divê zagon bên amadekirin."

Prz. Diyar Çetedîr destnîşan kir ku ev pêvajo di navbera Abdullah Ocalan, dewlet û komîsyona meclisê de tê birêvebirin û wiha bi dawî kir: "Yek ji aktorên bingehîn ên vê pêvajoyê Birêz Ocalan e. Ji bo wê divê şert û mercên wî li gorî vê pêvajoyê bên sazkirin. DMMEyê, sala 2014an, biryara binpêkirina mafê hêviyê da. Li gorî biryarê divê Birêz Ocalan demildest bê berdan. 11 sal in vê biryarê pêk naynin. Pêkanîna biryarê dê bibe pişt ji bo pêvajoya aştiya mayinde. Pêkanîna mafê hêviyê di nav pêşniyarên me de ye. Biryarên DMMEyê Tirkiyeyê eleqedar dikin. Divê biryar demildest pêk bê. Konseya Ewlehiyê ya Yekîtiya Ewropayê ji bo ku biryarên pêwîst bên dayîn, divê gavan biavêje û erka xwe pêk bîne."



## PÊDIVIYA CIVAKÊ JI NAN Û AVÊ BÊHTIR BI AŞTIYÊ HEYE

# Divê dewlet gav bavêje

■ Xecê Şen

*Zêdetirî deh salan bû ku têkiliya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û gel ji hev hatibû qutkirin. Dewletê tecrîdeke giran danîbû ser wî. Tecrîda ku li ser wî dihat meşandin di heman demê de li ser gel, partî û saziyan jî pêk dihat. Her wiha di vê pêvajoyê de şerê taybet ê li ser civakê jî kûrtir bû. Dewletê xwest bi van polîtîkayan gelê kurd ji nirxên wî dûr bixe û li gor xwe teşe bide civakê.*

*Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ê ku di bin şert û mercên giran de bû, berxwedana xwe ji bo civakê tim domand. Di encama têkoşîn û berxwedana wî ya di nav çar diwaran de, dewlet neçar ma ku pê re biaxive. Rêberê gelê kurd di encama van hevdîtinan de, 27ê sibata 2025an, bi rêya şandeya DEM Partiyê banga Aştî û Civaka Demokratîk li raya giştî kir.*

*Piştî vê banga dîrokî, Tevgera Jinên Azad (TJA), Partiyên Siyasî û Înîsiyatîfa Yekîtiya Demokratîk ji bo pêkanîna bangê dest bi xebatê kir. Di çerçoveya van xebatan de li hemû bajarên Tirkiye û bakurê Kurdistanê xebatên berfireh hatin meşandin.*

*Herî dawî Veysî Aktaş û Çetîn Arkaş ên ku piştî 30 salan ji girtîgehê derketin û demekê li gel Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan mabûn, xebata hevdîtinên bi gel re da destpêkirin. Civînên gel bi coşeke mezin didomin. Gel mijarên der barê pêvajoyê de û rewşa rêberê gelê kurd ji Veysî Aktaş û Çetîn Arkaş dipirse.*

*Em der barê van civînên ku pêk tên de, mijarên zêdetir dertên pêş û nêzîkatiya gel a li pêvajoyê bi hevşaredara Êlihê û aktivîsta TJAyê Gulistan Sonukê re axivîn.*



Aktivîsta TJAyê Gulistan Sonuk diyar kir ku civînên gel ên ku li ser pêvajoya aştiyê, manîfestoya civaka demokratîk û mafê hêviyê li herêmên Botan û Serhedê pêk anîne got: “Divê dewlet demildest erka xwe bi cih bîne, gavên hiqûqî û qanûnî biavêje û biryara mafê hêviyê pêk bîne.”



***Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, 27ê sibata 2025an, banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ev bang ji bo gel çi îfade dike?***

Ev pêvajo bi bangawaziya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a “Aştî û Civaka Demokratîk” dest pê kir. Vê bangawaziyê û bersiva PKKê bandoreke erênî li civaka Tirkiyeyê kir. Hêviya civakê a ji bo pêşerojek bi hev re û aştiyek birûmet zêde kir. Ji aliyê din ve jî, pêşî li ber siyaseta şer hat girtin û pêşiya rê û rêbazên nîqaşkirina siyaseta radîqal a demokratîk hat vekirin. Rêbertiyê bi bangawaziya 27ê sibatê ne tenê bang li PKKê kir, hemû amûrên qirqirinê yên desthilatdariyê jî ji destê wan derxistin û rê li ber çalakiyên gel ên demokratîk vekir. Ew kesên ku di çaresernekirina pirsgirêka kurdî de israr dikirin û çek wek hincet didîtin, piştî bangawaziya Rêber Abdullah Ocalan, polîtîkayên dewletê yên şerê taybet pûç bûn. Bi vî awayî pêşî li şer û mirinê jî hat girt. Nêzîkî salekê ye ji ber şer kes namire û nayên girtin.

***Civak çi ye û civaka demokratîk tê çi wateyê?***

Demokrasî rêbaza xwe ya birêvebirina civakê ye. Civak bi rêbaza demokrasiya radîqal hemû pirsgirêkên xwe ew bixwe çareser dike. Ji pirsgirêkên aboriyê bigire heta pirsgirêkên civakî ew bixwe çareser dike. Modela rêveberiya civaka demokratîk netewˍeya demokratîk e ku ew jî siyaseta demokratîk bi pêş dixe. Ji ber vê yekê jî di civaka demokratîk de hemû netewe, bawerî û çand dikarin xwe bi rêxistin bikin, di asta biryardayînê de jî xwedî gotin in. Civaka demokratîk jî li ser esasê komunan xwe bi rêxistin dike, bi rêbaza xwebirêxistinkirina komunan ew bixwe navend e. Ango civaka komunal bixwe li dijî navendîperestiyê ye û li cihê ku navendperestî lê hebe jî wî cihî qels dike û îradeya rêveberiya xwecihî ya demokrasiya redîqal xurt dike. Di civaka demokratîk de zagonên exlaqê û nirxên civakî esas tên girtin û herî zêde jî pêşî li ber komunên jin û ciwanan vedike. Lewra civaka ku ne demokratîk be, berevajiyê vê civakeke ne demokratîk derdikeve holê. Civaka paşverû, kapîtalîst yan jî civaka arîstokratîk û desthiladar her tim bûye xeteriya herî mezin a mirovahiyê. Di serdema nû de civakeke exlaqî, polîtîk ku li ser esasê nirxên xwe yên xwezayî, çand û zimanî bi modela xwebirêxistinkirin û xwebirêvebirinê tê avakirin jêneger e. Her wiha civaka demokratîk li dijî netewe-dewletê ye. Lewra netewe-dewlet polîtîkaya yekperestî, hiyerarşiyek hişk di nav xwe de dihewîne. Dewlet xwe navend dibîne û civakê jî wek derdora xwe. Ji ber ku hemû biryar ji navendê tên wergirtin, demokrasî tenê ji bo ku desthilatdarî fermî bibe tê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî pêdiviya civaka demokratîk wek nan û avê bi nenavedîbûnê heye.

***Hefteyek e hûn wek du koman li Botan û Sehedê bi gel re civînan pêk tînin. Armanca van civînan çi ye?***

Rêber Ocalan ji bo bangawaziya xwe ya dîrokî ya Manîfestoya Aşitî û Civaka Demokratîk gotibû: “Yê ku vê manîfestoyê jiyanî bike gel bixwe ye.” Ji ber vê yekê jî em bi gel re manîfestoyê nîqaş dikin. Sedema xwe jî ev e; nexşerêya vê pêvajoyê ya herdu aliyan jî (gelê kurd û dewlet) manîfesto ye. Di manîfestoyê de hem peywirên ji bo gel hene, hem jî ji bo dewletê. Heger rojek beriya rojekê herdu alî jî peywira xwe binîn cih, wê pêvajo zû bi pêş bikeve û aloziyên pêşiya pêvajoyê ji holê rabin. Sedemeke van civênan yek jî ev e ku; di serê gelê kurd de hin pirs hene divê bên zelal kirin. Bêguman sedema vê jî nêzîkatiya rayedarên dewletê û bikaranîna zimanê şerê taybet e. Pênaseyeke wan a taybet bi navê ‘Tirkiyeya bêteror’ heye ku ev pênase ziraræ dide pêvajoyê. Lê cihê kêfxweşiyê ye ku civaka me ya welatparêz di vê ferqê de ye. Di civînan de gelê me vê nêzîkatiyê rexne dike û li bendê ye ku herkes li gorî ruhê demê tev bigere. Mirov dikare bibêje ku bi van civînan jî piştgiriya gel a ji bo pêvajoya aştiyê û civaka demokratîk zêdetir dibe.

***Di koma heyetê de kî hene û gel wê çawa pêşwazî dike?***

Piştî pêvajoya 2013-2015an, ji deh salan zêdetir bû ku gelê kurd ti agahiyekê ji Rêber Ocalan wernedigirt. Careke din bi hewldana Serok bi qismî be jî ev tecrîd hat şikandin û bi saya wî di kesayeta Veysî Aktaş û Çetîn Arkaş de agahî û silav jê hat wergirtin. Ev bi rastî jî di nav gel de coş û kelecaneke mezin da çêkirin. Her civînek bû wek şahiyê. Silavên germ ên ji gravê hêviya gelan a ji bo aştiyê ji nû ve şîn kir.

***Di civînên gel de bêhtir li ser kîjan mijaran nîqaş tên kirin, hûn dikarin hinekî qala wê jî bikin?***

Em di civînên gel de herî zêdetir pêvajoya aştî û civaka demokratîk nîqaş dikin. Mijarên me bi gelemperî di vê çarçoveyê de ne: Ev pêvajo çima û çawa da dest pê kir? Divê pêvajoya aştiyê bi kîjan rêbazan bê birêvebirin da ku aştiyek birûmet pêk were? Girîngiya tifaqa navbera kurd û tirkan çima girîng e? Divê nûbûnek çawa pêk were? Bi rêbaza entegrasyona demokratîk, wê civaka demokratîk çawa were avakirin û dê çawa di komara demokratîk de cih bigire? Em di civînên gel de bi piranî li ser van pirsan disekinin. Her wiha girîngiya avakirina civaka demokratîk, yekîneyên komunan ji mijarên nîqaşên me ne û em hemû rexne û pêşniyarên gelê xwe dinivîsin.

***Gel pirsên çawa ji we dike û tişta ku herî zêde mereq dikin çi ye?***

Tişta ku herî zêde gel meraq dike, tenduristiya Serok e û şert û mercên giravê ne. Pirsên din jî nêzîkatî û zimanê rayedaran e. Dibêjin ku dewlet çima ti gavan navêje. An jî dibêjin ku gelo wê hebûna kurdan bi çand, ziman û dîroka xwe bê naskirin û bi qanûnan bê misogerkirin û hwd. Ev hemû di civînên gel de hatin pirsîn, bersivandin û nîqaşkirin. Bêguman dê ev nîqaşên me berdewam bikin.

***Daxwazên gel ên ji pêvajoyê çi ye?***

Ev pêvajo dualî dimeşe. Bêguman aliyekî wê gelê kurd e û wek sermuzakeravan Serok e, aliyê din jî dewlet e. Aliyê kurdî heta niha çi ketiye ser milê wî kirin û hemû gavên pêwîst avêtin. Li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan PKKê jî di navbera 5 û 7ê gulanê de li du cihên cuda bi awayekî hemwext kongreya xwe ya 12emîn li dar xist û biryara xwefesixkirinê da. Piştî fesixkirina PKKê jî, 11ê tîrmeha 2025an, bi navê “Koma Aştî û Civaka Demokratîk” komeke gerîlan bi pêşengiya hevserokа KCKê Besê Hozat, li herêma şikefta Caseneyê ya bi ser Dûkana Silêmaniyê ya başûrê Kurdistanê bi merasîmekê çekên xwe şewitandin. Wek gava 3yemîn jî, 26ê cotmeha 2025an, hemû hêzên xwe ji sînorên Tirkiyê vekişandin. Lê belê aliyê din yanî dewlet heta niha ti gavên berbiçav neavêtine û pir sist tevdigere. Bêguman ev nêzikatiya dewletê jî pêvajoyê dixitimîne. Tam jî di vî warî de daxwaza gel a herî sereke ew e ku divê demildest dewlet jî erka xwe bi cih bîne, gavên zagonî biavêje, mafê hêviyê pêk bîne. Dîsa daxwaza gel ew e ku Rêber Abdullah Ocalan bi awayekî fizîkî azad bibe û vê pêvajoya aştiyê bi rê ve bibe. Daxwaza din jî ev e ku divê hemû girtiyên siyasî bên berdan, ji bo gerîla tevlî avakirina civaka demokratîk bibin û siyaseta demokratîk bimeşînin, gavên hiqûq û qanûnî yên bingehîn bên avêtin.

***Nêrînên gel ên li ser civaka demokratîk çi ne û çawa pênase dikin?***

Bi rastî gelê kurd di rastiya xwe de ji demokrasiyê ne dûr e. Bi sedan sal in ku gelê kurd bê dewlet xwe birêxistin dike û xwe bi awayekî komunal bi rê ve dibe. Yanî mirov dikare bêje ku gelê kurd ne xerîbê civaka demokratîk e. Ev di hemû civîn û nîqaşên gel de bi awayekî zelal detên holê. Ev jî ji bo me cihê kêfxweşî û şanaziyê ye. Em di vê baweriyê de ne ku em ji her demê hêsantir û zûtir komunên xwe yên demokratîk ava bikin û ji komara demokratîk re pêşengiyê bikin. Bi vê hêvî û baweriyê em di serî de jinan û hemû gelê azadîxwaz silav dikin û banga tevlîbûna civaka demokratîk dikin.

# Xwebûn

**Beden ji xeynî bîr, rûmet û hebûna xwe dikare her tiştên aîdî xwe ji ser xwe biavêje, feda bike û hilweşîne, bi bîr, rûmet an jî hebûnê dikare ji xwe re tiştên wisa ava bike ku deh qatan li tiştên berê be.**



Elîxan Loran


Ji niha şûn de 15 rojan carekê, em ê hewl bidin li vir teşiya wêje, ziman, huner, civak û ramyariyê badin. Em ê carinan hiriyê birêsînin carinan jî verîsînin.

Gotineke pêşiyan heye dibêje "Bêyî Xwedê dibe lê bêyî xwedî nabe". Di vir de mebest ne bawernekirina ji Xwedê û înkarkirina Xwedê, ne jî pîrozkirin û rewakirina xwedî/efendî/desthilatdariyê ye. Mebesta ji "xwedîbûnê" tê wateya rêxistinbûn, hevgirtin, piştgiriya kom an jî civatekê. Ji ber ku pêşiyan baş dizanî, mirov ji hêzeke îlahî wêdetir bi hêzeke şênber û berçav dikare bigihîje armancên xwe, şer bike, li ber xwe bide û heq ji karê xwe derkeve û têkiliya bi "xwedîbûnê" jî nabe ku têkiliyeke metayî, desthilatdarî û hîyerarşîk be. Divê ev têkilî ji hundir ber bi derve ve, ji jêr ber bi jor ve û ji navendê ber bi dûrahiyan direj bibe, ev jî dibe "xwebûn". Ji bo ku mirov bibe "xwe"-ev jî diyar dike ji ber êrîş û zextên li ser mirovbûnê, mirov berê ji xwebûnê, piştre ji kesbûnê û herî dawî jî ji mirovbûnê derketine- divê berê xwe ji toz û tebar, gend û demar, zeng û zingara zext û zoriyan daweşîne, qilêra ji ber dîrokê mayî ji ser xwe bixeritîne.

Di dema xeritandina qilêra dîrokê de dema beden xwînî bû, divê bihêle ew xwîna qirêjî jî biherike. Beden dizane ji bo ku ew xwe nû bike, divê piçekî xwîn biherike û bi vî awayî beden xwîna nû çêdike. Di heman demê de beden dîsa dizane dema xwîn zêde biherike dibe ku ew bimire jî. Li vir helwesta bedenê dibe helwesta "xwebûnê", ji xeynî bîr, rûmet û hebûna xwe dikare her tiştên aîdî xwe ji ser xwe biavêje, feda bike û hilweşîne û piştre bi bîr, rûmet an jî hebûnê dikare ji xwe re tiştên wisa ava û saz bike ku deh katan li tiştên berê be.

Di qonaxên ber bi "xwebûnê" de, nabe ku "xwînî"bûn bi dermanên ji derve were sekinandin. Di "xwebûnê" de "îthalat" û "îhracat"ên ramyarî û felsefîk hene lê dermanê sekinandina xwînê ji derve nayê. Di xwebûnê de, birîn divê qalikê birîna xwe ji xwe re hayevnê pakbûn û başbûnê, çawa ji bo ku "bibe xwe" xuriya û krîz û belaya "xwebûnê" anî serê xwe, dîsa ew baş dizane ku xuriya mirov bi destê xelqê naşikê. Ew ê xura xwe bişikîne, di rêya "xwebûnê" de krîz û belaya ku aniye serê xwe, wê ji xwe re bike firsendeke xweavakirinê.

"Xwebûn" ji biryardayîna "xwe-xwînîkirinê" û "xwînîbûnê" tê. Pêşiyan gotiye "Serê naêşe, paçikan lê negerîne" lê "xwebûn" ev e ku "serê naêşe" bişikîne, xwînê jê berde û bi ser de paçikan jî lê negerîne. Di rewşa "ne-xwebûnê" de ew paçik belkî karibe bibe derman û êşbirek lê di "xwebûnê" de pêdivî bi paçikekî xerîb tune, ew paçikê ku ji bo kesên "nebûne xwe" pêdiviyeke lezgîn be jî, ji bo kesên "bûne xwe" ew paçik encax bibe destmaleke ji bo govendê.





"Xwebûn" heke darek be, ji bo ku ew dar baş bişixule û mezin bibe, divê kesaxtina wê darê pêk were. Ba û bahoz dibe ku hin şax û guliyên darê bişikîne lê dar di rêya "xwebûn"ê de divê qîma xwe bi vî tiştî neyne û ji xeynî şax û guliyên wê yên hatine şikandin, divê ew şax û guliyên xwe jêbike, bişikîne û bikesixîne. Ji ber ku di felsefeya "xwebûnê" de ne tiştên ku mirov xwediyê wê ye li ser hesabê mirov were hesibandin, tiştên ku mirov dev jê berdaye, tiştên ku te ew red kiriye yan jî tiştên ku te ew şewitandine dikare ya te be. Di rêya xwebûnê de ne canê ku mirov pê dijî yê mirov e, canê ku mirov feda kiriye û daye rêya tiştekî dikare bibe yê mirov.

Pêşiyên me ji bo teşwîqkirina "xwebûnê" gotiye "çavê li deriyan, xwelî li seriyan". Di qonaxên "xwebûnê" de jî derî hene, lê ev derî ne ji bo vî tiştî ne ku, kesek an jî tiştek ji derî were. Ev derî ji bo çûyînê ne. Di dawiya deriyan de "xwebûn" heye û di her deriyekî de kirasê ku li bejna "xwebûnê" nayê û "xwebûnê" dişidîne ji ser xwe diavêje. Di her deriyekî an jî qonaxekê de, kirasê tirsê, kirasê stûxwariyê, kirasê lixweheyirînê, kirasê tenêmanê, kirasê xem û tasewasan ji ser xwe diavêje. Di dawiya deriyan de wê "xwebûn" tazî bimîne, lê ev tazîbûn ne tazîbûna bedenî ye, ev tazîbûna avêtina maskeyên li ser bedenê ye, ev tazîbûn belavkirina mijê li ser ramyariyê ye, ev tazîbûn serbilindiya agirê xwebûnê ye. Ji ber ku agir jî tazî ye û wê hemû tebeqeyên li ser xwe avêtine. Çawa ku volkanek ji binê erdê dizê û agir dibarîne ser erdê, xwebûn jî ji volkanên hundirê xwe dizê, tebeqeyên hişê xwe diteqîne û agir dipekîne.

Xwebûn tê wateya ku ew navika xwe bi xwe bibire, heke li ber fetisandinê be ew karibe ava golê gişî vexwe, heke di bin aşîtê de mabe ew karibe hemû berfê bixwe û xwe rizgar bike, heke di berf û bûkê de li derve mabe, wekî eskîmoyan (înûît) ew karibe ji berfê ji xwe re îgloyan (malokên ji berf û cemedê) çêbike.

Bi kurtasî bêyî Xwedê dibe, bêyî xwedî dibe lê bêyî xwebûnê nabe!

---

Mîna Acar

# Hafizeya şikestî

***Hevalê min li ser konpîterê werger dikir, carê serê xwe dizîvirand û li min dinihêrî.***

Ez têdigîhiştim ku ew ê tiştekî ji min re bibêje. Pir dem neket navberê, dîsa serê xwe zîvirand û got "wê nivîskarek ji Ewropayê were, li tercumanekî digere da ku li Amed, Heskîf û Mêrdînê li cihên dîrokî bigere... Ez dixwazim tu jî bi me re werî, ger ew jî qebûl bike." Bêyî ku ya dilê xwe bibêjim, wî berî min ser temam kir û got, "Erê ez dixwazim tu jî bi me re werî". Min li çavên wî nihêrî û got "temam", lê ne ku ji dilê min hat. Min bixwe jî fêhm nekir ji bo çi bêyî dilê xwe diçim? Lê ji dilê min nedihat bibêjim "na" jî. Ya rast ez bi şik bûm, gelo ji dil dixwest ez bi wan re herim?

Min dizanibû ku ez ê ti carî negihîştima bersiva rast, lewma jî min zêde guhê xwe nedayê.

Danê sibê me xwe amade kir û berî da Mêrdînê û em çûn me mêvana xwe ji otêlê wergirt. Wê bi zimanê biyanî ji me pirsî, min jî bi kurmancî lê vegerand. Tercuman di navbera me de çû û hat. Mîna cotkarekî ku di navbera mal û erdê xwe de here û were. Min ji wê pirsî got, "Tiştekî bala min kişand, gelo tu bo çi difikirî Heskîfa di binê avê de bibinî?" Bîstekê fikirî û ev nivîskara nêzîkî şêst salî xemgîn bû û got, "Ez cara ewil di 20 saliya xwe de hatim, min dît û gelekî di bin bandora wê de mam. Li vegerê gundek li ser rê hebû. Min li wî gundî wêneyên zarokan girtin." Hîn gotina xwe berdewam dikir, hin wêne direjî min kirin. Belê, wêneyên zarokên kurdan bûn. Bi solên laylon, kirasên kin û pantorên bidevdeling, rûyên wan ên gemarî... Hin ji wan nû ji berhevkirina pembû, ji ser erdan hatibûn. Ez kêfxweş bûn ku yeka biyanî qîmet dabû wan û bi kêfxweşî sûretên wan girtibûn. Me wê rojê bi gera li Mêrdînê roja xwe bihart. Êvarê me ew danî otêlê û em vegeriyan malê.

Serê sibê em dîsa bi rê ketin û me berî da Mêrdînê, otêla ku me ya biyanî jê wergirtibû. Îro jî me ew wergirt û vê carê me berî da Heskîfê; bi dilekî kul ku çavên min nedixwestin mîraseke çandî, dîrokî û bêhempa di bin avê de bibîne. Lê dîsa em li ser rê bûn û diçûn. Ti carî em ji çand, ziman û rastiya xwe dûr nediketin...

Dema em nêz dibûn dilê min dikir teperep û min ji xwe dipirsî, "Gelo ez dikarim vê xemgîniyê li xwe ragirim?" Berî ku bizanibim em bêhtir nêz bûn. Em hatin ber mizgefta wê sekinîn, lê ji bilî wê ji wê gencîneyê ti tişt nemabû. Me Heskîfa xwe nedît! Li dewsa wê, vîllayên fabrîqasyon ên di şiklekî de ku çavên mirov diêşandin, hatibûn avakirin. Bawer dikim, tenê niştecihên dewlemend ên hay ji bîra xwe ya dîrokî nînin, di wan de bi cih bûbûn.

Dema vê jina biyanî ku gelekî xemgîn bû, xwe da aliyekî û li lênûska xwe tiştin nivîsîn, min jî di heman demê de di dilê xwe de dinivîsand. Em nepeyivîn li ser ti tiştî...

Mîna peykerekî ji axa xwe hatiye qewirandin, ez li hemberî wê manzereyê lal û mat mabûm. Ew bêdengiya ku kete navbera me, ne ji nebûna gotinan bû; ji giraniya heqîqetê bû.

Avê her tişt daqurtandibûn, lê ya ku di bin wê ava lalkirî de mabû, ne tenê kevir û minare bûn; ew zaroktiya me bû, ew dengê kalikên me bû ku bi hezaran salan di nav wan zinaran de deng vedabûn. Ew vîllayên spî û sar ên ku li şûna dîrokê hatibûn çandin, mîna kêlên goristaneke nûjen, bêruh û bêname bûn. Ew ne xanî bûn, ew perdeyên betonî bûn ku hatibûn kişandin da ku em bîranînên xwe nebînin.

Min çavên xwe li jina biyanî gerandin. Pênûsa wê li ser kaxezê digeriya, hewl dida ku vê wêraniyê, vê valahiyê tomar bike. Lê gelo kîjan murekkeb dikare şûna bîranîneke şikestî bigire? Ew gerokek bû ku li "wendabûna bedewiyê" digeriya; lê ez... ez parçeyek ji canê xwe li wir, di bin wê kûrahiya tarî de digindirîm.

Wê gavê min fêhm kir ku bîr, ne ew tişt e ku di wêneyên kevn de tê parastin. Bîr, ew êşa kûr e ku dema mirov li valahiyê dinêre, di sînga mirov de çêdibe. Av dikare bajaran veşêre, dikare zinaran bixeniqîne, lê gelo dikare wê şopa ku li ser giyanê me hiştiye paqij bike? Em sê kes li wir sekinîbûn; yekî dinivîsî, yekî werdigerand, û ez di bêdengiya xwe de diqîriyam. Me Heskîf wenda nekiribû, me neynika ku me rûyê xwe tê de didît şikandibû. Û niha, di parçeyên wê neynikê de, her yek ji me li rûyekî biyanî digeriya.





Xweşkanî
Felemez Ulug

# Siyaseta qirêj û talana bêsînor

Şerê taybet tenê bi rûmeteke bilind û bi rêxistinkirineke herêmî û radîkal tê têkbirin. Divê her malek, her taxek bibe keleha berxwedanê ya li dijî vê qirêjiyê. Divê em li hemberî talankerên siruştê û kujerên civakê bibin yek hêz. Hêrs ne bes e, rêxistinbûn şert e!

Îro li bakurê Kurdistanê, em ne tenê bi dagirkeriyeke leşkerî, lê bi qirkirineke spî û talanê re jî rû bi rû ne. Dewleta tirk, bi hemû qirêjiya xwe ya dîrokî, polîtîkayên şerê taybet xistiye qonaxeke nû ku armanca wê ne tenê şikandina îradeya siyasî, lê helandina cewherê civakê û talankirina axa pîroz e jî. Ev êrişeke wisa hov e ku ji canê ciwanan bigire heta koka darên li çiyayan, her tiştî dike hedef.

Dewlet bi zanebûn deriyên Kurdistanê ji bo her cure qirêjiyê vekiriye. Kesên ku ji aliyê pergala dewletê ve hatine perwerdekirin, îro li kolanên bajarên bakurê Kurdistanê bi taybet jî li Amed, Şirnex û Colemêrgê, mîna vîrusekê belav dibin. Tiryak, fihûş û dizî ne encamên krîza aborî ne; ev çekên kîmyewî yên li dijî nirxên civakî ne! Dewlet bi destê çeteyên krîmînal dixwaze ciwanên kurd ji nasnameya wan, ji rûmeta wan û ji têkoşîna wan dûr bixe. Dema ku ciwanek di nav çirava tiryakê de wenda dibe, dewlet li navendên xwe yên şerê taybet wan dixe bin xizmeta xwe û ji bo armancên xwe yên qirêj bi kar tîne. Ev planeke ji bo kuştina ruhê neteweyî ye.

**Talana sînoranenas**

Li aliyê din, sirûşta Kurdistanê bi hovîtiyeke bêhempa tê talankirin. Şîrketên ku ji bermahiyên AKPê xwedî dibin, mîna vampîran ketine nav çiya û geliyên me. Bi navê kanên madenê û bendavan, rehên axê tên hişkkirin, jiyan tê zuhakirin.

Tiştê ku li çiyayê Kurdistanê bi taybet jî li Cûdî û Bestayê diqewime, ne tenê birîna daran e; ew birîna nefesa gelê kurd e. Ew cerdevanên ku bi çavdêriya eskeran darên me dibirin û wek êzing difroşin, ne tenê darê, rûmeta xwe jî difroşin. Axek ku bêdar û bêav bimîne, axeke kuştî ye. Ev polîtîkaya erdê şewitî ya sedsala 21ê ye ku dixwazin Kurdistanê bikin çoleke bêmirov. Mirov nikare vê siyasta talanê ji polîtîkayên dewletê cudatir bibîne.

**Bêdengî yan bêrêxistinî?**

Lê belê, ya herî bieş û ya ku divê em bi tûjî rexne bikin, ne tenê hovîtiya dijmin e; ew bêdengî û bêrêxistiniya me ye jî! Erê, nerazîbûn hene, daxuyanî tên dayîn, lê ma ev bes in? Heta ku ev nerazîbûn nebin hêzeke birêxistinkirî, heta ku em kolan bi kolan li dijî firoşkarên tiryakê û talankerên xwezayê û kesên jinên ciwan dikişînin nav tora fihûşê ranebin, dijmin wê hîn bêhtir har bibe û êrişan bike.

Em wek civak û wek saziyên siyasî, di nav xemsariyeke kujer de ne! Hêrsa me di nav daxuyaniyên çapemeniyê de diçike, lê di pratîkê de encameke ku rê li ber van kiryaran bigire nayê dîtin. Ma em ê heta kengî tenê temaşevan bin? Ger îro em nikaribin zarokên xwe ji çengê fihûş û tiryakê derbixin, ger em nikaribin pêşî li birîna darên xwe bigirin, em ê çawa behsa azadiya welatekî bikin!

Li vir rexneya herî giran li me û saziyên me ye. Polîtîkayên dewletê diyar in, lê têkoşîna li dijî şerê taybet ketiye nav rutîneke. Li taxekê ku tiryak lê tê firotin, ger gel bixwe ranebe û wan firoşkaran dernexîne, daxuyaniyên partiyan tu encaman nadin. Civak hêdî hêdî hînî van nûçeyên talanê dibe. Normalîzekirina talanê, serkeftina herî mezin a şerê taybet e. Em li benda hêzeke derveyî ne ku were me xelas bike. Lê belê, heta ku em parastina cewherî (parastina taxê, parastina xwezayê) saz nekin, ev qirêjî wê bêhtir belav bibe.

**Divê çi bê kirin?**

Divê em ji şêwaza şermezarkirinê derbasî şêwaza pêşîgirtin û parastinê bibin. Her malek divê bibe dibistanek, her taxek divê bibe qadeke berxwedanê ya li dijî çeteyan. Ji bo ku civak li hemberî vî şerî nebe mexdûr û bibe hêza çareseriyê, divê sîstema parastina cewherî ne tenê di warê leşkerî de, di her kêliya jiyana civakî de bibe bingeha sereke. Parastina cewherî, mafê her zindî ye ku xwe li hemberî êrişan biparêze; mîna ku gul striyên xwe hene, divê civak jî striyên xwe yên rêxistinkirî li dijî vê qirêjiyê derbixe.

Ji bo rêbazên têkoşînê yên li dijî şerê taybet werin xurtkirin, divê pêşî hişmendî û perwerdeya radîkal û zanistî were avakirin. Şerê taybet di mêjî de dest pê dike. Heta ku em nexşeya dijmin nas nekin, em nikarin li dijî wê şer bikin. Di her taxê de divê komunên xwendinê û nîqaşê werin avakirin. Ciwan divê fêr bibin ku tiryak û fihûş ne kêf in, ew çek in ku ji bo tunekirina îradeya wan hatine çêkirin. Divê kesên ku sixuriyê dikin, tiryakê difroşin an jî fihûşê bi rê ve dibin, bi belgeyan di nav civakê de werin deşîfrekirin û rûreşkirin. Bila her kes bizanibe kî û çawa bi nirxên wan ên bingehîn dilîzin û dixwazin têk dibin.

Avakirina komîteyên parastina taxan ango xwe rêxistinkirin yek ji hîmên herî sereke yê li dijî her cure êrişan in ku li ser civakê tên ferzkirin. Em nikarin li benda polîs an dadgehên dewletê bin ku me biparêzin, ji ber ku ew bixwe amûrên vî şerî ne. Ew bixwe şerê taybet li Kurdistanê rewa dikin. Ciwan divê li taxên xwe tîmên şopandinê ava bikin. Divê têketin û derketina kesên biguman di bin çavdêriya ciwanan de be. Malbatên ku zarokên wan ketine xefka tiryakê, divê tenê neyên hiştin. Divê li her taxê komîteyên piştgiriyê werin avakirin da ku wan ciwanan ji nû ve qezenc bikin.

Siberojeke geş û xweş a Kurdistanê ne bi hovîtiya dewletê, bi vîn û xebata ciwanên serhildêr dê bê avakirin. Parastina cewherî ne tenê hilgirtina çekê; ew hilgirtina rûmetê, parastina hevalê xwe û xwedîderketina li dar û devî û berên çiyayên me ye.

Dem dema wê ye ku em ji vê xewa giran şiyar bibin. Şerê taybet tenê bi rûmeteke bilind û bi rêxistinkirineke herêmî û radîkal tê têkbirin. Divê her malek, her taxek bibe keleha berxwedanê ya li dijî vê qirêjiyê. Divê em li hemberî talankerên sirûştê û kujerên civakê bibin yek hêz. Yan em ê bi rûmet li axa xwe û nirxên xwe xwedî derkevin, yan jî em ê di bin vê heriya qirêj a dewletê de wenda bibin. Hêrs ne bes e, rêxistinbûn şert e!



# Hevdîtinên HSD-Şamê, gefên Tirkiyeyê û rastiya qadê

H. Halît Alaçatî

Hevdîtinên di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û Hikûmeta Demkî ya Sûriyeyê de berdewam dikin. Ev hevdîtin berî ku Ahmed Şara biçe Amerîkayê û bi serokdewletê DYAyê Donald Trump re hevdîtinê pêk bîne, di navbera her du aliyan de hatibûn zelalkirin. Lê bi mudaxeleya Tirkiyeyê ev pêvajo rawestiya. Piştî hevdîtina li Washingtonê Şara jî êdî çi ji hevdîtinê fêm kiribe, xwedî li peymanê derneket. Li bendê bû ku DYA zorê li HSDê bike û daxwazên Şamê bi cih bîne.

Hevdîtinên Şam û Qamişloyê bi vê boneyê ev demek bû rawestiyabûn. Ligel vê yekê Tirkiye dest bi şerê psîkolojîk kir. Li aliyekî hewl da, bi operasyonên propagandayê nîşan bidin ku HSD ji pêkanîna peymanê direve û li aliyê din jî nûçeyên operasyonê weşandin ku li navenda saziyên îstîxbaratê hatine nivîsandin. Xwestin ku bi şerê taybet, bi gelê kurd paşve gav bidin avêtin.

Lê rastiyên qadê li gorî şerê taybet ê Tirkiye û xeyalên Şara ne. Siyaseta kurdî hem rastiya peymanê danî holê û hem jî nîşan da ka kî ji peymanê direve. Hat dîtin ku Tirkiye siyaseta "An tevahiya Sûriyeyê dê bibe milkê min an jî ez destûr nadim çareseriyê" dimeşîne. Li ser xitimîna hevdîtinan Nûnerê Taybet ê Trump cardin ket dewrê û serdana Şara kir. Bi zelalî Şara hişyar kir û xwest ku berî her kesî li DYAyê guhdarî bike. Tê dîtin ku Şara jî peyam wergirtiye.

Piştre jî ji Şamê, Barrack derbasî Îsraîlê bû û bi serokwezîrê Îsraîlê Binyamîn Netanyahû re hat cem hev. Li vir jî Barrack peyamên zelal dan. Barrack peyamên Trump ji bo Netanyahû jî ragihandin. Barrack ji Îsraîlê re got ku Trump naxwaze peymana Xezayê bê binpêkirin, operasyona li hemberî Libnanê hinek bê rawestandin û di mijara Sûriyeyê de jî giraniyê bide rêyên dîplomatîk. Bêguman misogeriya ku dê daxwazên Îsraîlê pêk bên jî dan Netanyahû.

Rawestgeha sêyemîn a Barrack jî Enqere bû û bi Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan re hat cem hev. Peyamên dan Şara bi Tirkiyeyê re jî parve kirin û xwest ku rêzê ji peymana di navbera Şam û Qamişlo de bigire, zêde mudahele neke. Li ser vê trafîkê Şamê cara yekemîn têkildarî entegrasyonê pêşnûmeyek ji 13 xalan pêk tê radestî Rêveberiya Xweser kir. Ev ji bo destpêka muzakereyan gavek erênî bû.

Lê bi qasî ku ji daxuaniyên Rêveberiya Xweser tê fêmkirin, pêşnûma li ser entegrasyona leşkerî hûr dibe û qadên siyasî, aborî, çandî û makezagona nû wernagire nav xwe. Bêguman ev tiştek ji bo Rêveberiya Xweser bê qebûlkirin nîn e. Divê hemû xalên Peymana 10ê Adarê bihundirîne. Lê ev dikare gav bi gav biçe. Niha HSD dê wekî sê tumenan tev li artêşa Sûriyeyê bibe. Ango HSD xweseriya xwe diparêze. Niha divê xweseriya siyasî, makezagon û xalên din jî bên muzakerekirin.

Di demeke kin de Îngilîstanê nûnerek xwe dişîne gel Rêveberiya Xweser. Wekî tê zanîn Londra her çiqas li pêş perdê xuya neke jî mîmarê piştperdê ew e. Bi îhtîmaleke mezin dê hewl bide navbeynkariya xalên mayî bike. Lê divê bê zanîn Londra ku aqilmendê HTŞ û Şara ye û heta neçar nebe başiya kurdan naxwaze. Bi îhtîmaleke mezin dê hewl bide daxwazên Tirkiyeyê bisepîne.

Bi kurtasî Rojava û Sûriye ketin pêvajoyeke nû. Di serî de hemû hêzên siyasî divê gelê kurd piştgiriyê bide Rojava. Ji bo zêdetrî statû û mafan kî li ku derê bibe bila bibe, çi ji dest tê divê bike. Roj roja xwedîderketina li Rojava û misogerkirina statûyê ye.

# Şopdarên heqîqetê: **Cîhan û Nazim**

Navenda Nûçeyan

Rojnameger Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dema berxwedana gelan ji refên pêş ve dişopandin, di 19ê Kanûna 2024an de di êrişa SÎHAya dewleta tirk a li Bendava Tişrînê jiyana xwe ji dest dan. Herdu rojnameger, dema li dû heqîqetê bûn û propagandayên reş ên tora di bin kontrola desthilatdariyê de pûç dikirin, ji ber ku bûbûn dengê heqîqetê, hatin kuştin.


Rojnameger Dîlan Dîlok li ser jiyan û rojnamegeriya Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn bîranînên xwe parve kir. Rojnameger Dîlan Dîlok a ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi Nazim û Cîhan re xebitî, rojnamegeriya herdu hevrêyên xwe yên li qada şer ji Ajansa Mezopotmayayê re nirxand.

Dîlan Dîlok anî ziman ku nêzî 15 sal berê Nazim nas kiriye û ew dema Nazim li Dîlok dixebitî, bi rêya serdanên malbatê wî nas kiriye. Dîla Dîlok, bal kişand ser dilpakî û jidilbûna Nazim û got: "Nazim endamekî malbatê bû, ew biçûya kîjan malê, dibû zarokê wê malê. Bi dilpakiya xwe, gel Nazim wekî zarokê xwe nas dikir. Li her çar parçeyên Kurdistanê ked û xebata Nazim heye. Me êdî ne tenê di serdanên malê de li nava xebatan jî hev didît. Nazim baweriya mirov vala dernedixist. Piştre ket girtîgehê, li Başûr û li Rojava rojnemevanî kir, keda Nazim li hemû parçeyên Kurdistanê heye. Li Rojava pêvajoyeke şoreş dest pê kir û Nazim hat vir.

Dîlan Dîlok çîroka nasîna xwe ya bi Cîhan re jî wiha got: "Nazim ez bi Cîhan re dam naskirin. Cîhan, hevaleke ku dixwest hevrêyên wê bi ser bikevin bû. Tehemula wê ji mirovên serneketî re tune bû. Dilnizm, bi ken û serkeftî bûn. Berî Cîhan jiyana xwe ji dest bide, ew di heman malê de bûn û mala wan wekî qada xebatê bû. Bi çûna malê re yekem tişta me dikir, lêkolîna nûçeyan bû. Me her tim têkildarî nûçeyan gotûbêj dikir. Herduyan jî xwe bi temamî dabûn xebata xwe. Dema bûyerên Minbicê qewimîn, yekem rojnamevanê ku çû Nazim bû. Paşê Cîhan çû herêmê. Armanca herduyan jî yek bû. Derewên medya Tirk, rastiya nûçeyên ku ji bo tirsandina gel tên çêkirin, ji hemû cîhanê re ragihînin. Nazim li Minbicê li saziyên Rêveberiya Xweser û nexweşxaneyan dîmen kişand. Cîhanê jî li ser Bendava Tişrînê pêşkêşiya nûçeyan kir û rastiya li herêmê nîşan da."

Dîlan Dîlok destnîşan kir ku armanca wan ronîkirina derewên dewleta tirk bû û got: "Ev jî bû sedem ku bibin hedef. Armanca wan ji destpêkê ve ev bû. Wan berxwedana li qadê nîşan didan.

Dîlan Dîlok, diyar kir ku şerê Tişrînê gelek girîng û destanî ye û rola Nazim û Cîhan a di ragihandina vê destanê de wiha vegot: "Lehengên vê destanê Nazim û Cîhan in. Bi saya wan berxwedan derket holê. Heke Nazim û Cîhan nebûna, dewleta tirk dê bi rêya medya û medyaya dijîtal nîşan bida ku herêm bi temamî xistiye destê xwe. Wan, li gel şer, berxwedan jî nîşan dan; ewlehiya gel û şervanan derxistin holê. Wan îspat kir ku rola çapemeniyê ya di aştiyê û di şer de, di aşkerakirina rastiyên gel de girîng e. Nûçeyên wan û aşkerekirina dezenformasyonê, wan kir hedef. Nazim û Cîhan ji destpêkê ve hewl didan rastiyên gelekî derxin holê. Ji bo vê armancê ji warên xwe hatin qadên azadiyê û şehîd bûn. Herduyan jî îspat kirin ku ew bi rastî zarokên gel û rojnamegeran in."



Dîlan Dîlok, got ku divê mirov wekî Nazim û Cîhan in û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Em peyrewên wan in. Çawa ku ew peyrewên Apê Mûsa û Gurbetelî Ersoz bûn û heta nefesa xwe ya dawî ji bo hêjayî wan bin têkoşiyan, divê em jî ji niha û şûn de, hêjayî Nazim û Cîhan bin. Bi vî awayî em ê nîşan bidin ku em hevrêyên Nazim û Cîhan in."

Yek ji edîtorê ANHAyê rojnameger Ekrem Berekat ku bi Cîhan Bîlgîn re bi salan xebitî û Nazim Daştan jî ji nêz vê nas dikir, ji Ajansa Welat re axivî. Ekrem Berekat diyar kir ku nêzî 10 sal berê wî Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn nas kiriye û bi hev re demek dirêj xebitîne û got: "Min ji berê ve navê heval Nazim bihîstibû. Heval Nazim têkiliya çeteyên DAIŞ û dewleta tirk derxistibû holê, me ji wir navê wî bihîstibû. Ji bo min şansekî pir mezin bû ku min herdu heval nas kirin û em bi hev re xebitîn."

# ‘Sosyalîzma’ Stalîn

Têgiha “sosyalîzm li welatekî”, ku di dawiyê de ji hêla Stalîn ve di salên 1924-1926an de piştî mirina Lenîn û têkoşîna bi Trotsky re hat formulekirin; ne tenê avahiyek teorîk bû, lê bersivek pratîkî bû ji bo dijwariyên demê



Kurdistan Lezgiyeva

Em gelek caran klîşeyan bêyî ku naveroka wan bifikirin bi kar tînin. Yek ji wan klîşeya “sosyalîzm”ê ye. Li gorî marksîzma klasîk, sosyalîzm qonaxa yekemîn a komunîzmê ye. Civak bi keda azad, ku tê de dewlet hin bi hin biçûk dibe, û bi komeleyek hilberînerên azad, aboriyê li ser bingeha demokrasiya berfireh bi rê ve dibe. Werin em analîz bikin ka Stalîn ji vê têgihê çi fêm dikir.

Têgiha “sosyalîzm li welatekî”, ku di dawiyê de ji hêla Stalîn ve di salên 1924-1926an de piştî mirina Lenîn û têkoşîna bi Trotsky re hat formulekirin; ne tenê avahiyek teorîk bû, lê bersivek pratîkî bû ji bo dijwariyên demê. Ew bû bingeha îdeolojîk ji bo modernîzekirina Yekîtiya Sovyetê û parastina desthilatdariyê.

***Stalîn bi têgiha “sosyalîzm” çi armanc dikir?***

***1. Bingeha Aborî:*** Dewletbûn (Statîzasyon) a tevahî ya milkê

Ji bo Stalîn, sosyalîzm bi rakirina hemû xwedîtiyên taybet ên amûrên hilberînê û komkirina wê di destê dewletê de hevwate bû. Ev kevirê bingehîn bû.

***Neteweyîkirina pîşesaziyê:*** Kontrola tevahî ya dewletê li ser hemû pîşesaziyên mezin û paşê yên navîn, bi rêya sîstema Komîseriya Gel e.

***Kolektîvîzekirina çandiniyê:*** Rakirina çandiniya gundiyên taybet û şûna wê bi zeviyên kolektîf birêvebirin e. Erd bi fermî aîdî zeviyên kolektîf bû. Lê di rastiyê de aîdî dewletê bû. Rakirina Bermayiyên bazarê: Têkoşîneke domdar li dijî bazirganiya taybet, hunerên destan û her cure dahata neqezenckirî ye.

***Encam:*** Sosyalîzma stalînîst sîstemeke dewlet-îdarî ya birêvebirina aboriya neteweyî ye, ku tê de dewlet wekî xwediyê yekane, rêveber û plansaz tevdigere.

***2. Sîstema siyasî: Dîktatoriya dewleta partiyê***

Li vir, Stalîn ramana klasîk a Marksîst a “ji holêrakirina dewletê” bi awayekî radîkal ji nû ve xebitand.

***Yekbûna partî û dewletê:*** Partiya Komunîst a Yekîtiya Hemûyan (Bolşevîk) êdî tenê partiyeke siyasî nebû. Ew bû pişta dewletê, elîta wê ya rêveber û kontrolker.

***Dîktatoriya şexsî:*** Bi rastî, “sosyalîzm” tê wateya desthilatdariya mutleq a Stalîn bixwe û derdora wî ya hundurîn. ‘‘Sîstema encumenan’’ bû pêvekek xemilandî, saziyek ku biryaran mohr dikir û biryarên partiyê pesend dikir.



***Encam:*** Ji bo Stalîn, sosyalîzm dewletek pir navendî bû, ku ji hêla yek partî û rêber ve dihat birêvebirin, ku her dijberî, nerazîbûn an jî partîparêzî bi terorê dihat tepisandin.

***3. Pêkhateya îdeolojîk: Bolşevîzma neteweyî ya seferberyê***

Stalîn retorîka komunîst bi nirxên hêza mezin, hema hema bi împaratoriyê re kir yek.

***Fikra “kelehê”:*** Yekîtiya Sovyetê wekî kelehek dorpêçkirî hat pêşkêşkirin, ku ji hêla cîhanek kapîtalîst a dijminane ve hatibû dorpêçkirin. Ev yek qurbanî, leşkerîkirin û gumanbariya tund (sîxuriyê) rewa dikir.

***Welatparêzî û kevneşopî:*** Paşveçûnek ji enternasyonalîzma şoreşger û kozmopolîtîzma bolşevîkên destpêkê hebû. Qehremanên neteweyî û dewletê (Alexander Nevsky, Suvorov) hatin vejandin. Malbata kevneşopî hat xurtkirin (qanûnên dijî kurtajê, 1936), û cilên yekreng û rutbe di artêşê de hatin destnîşankirin. Sosyalîzm divê mezin û bi hêz be.

***Kulta kedê:*** Tevgera Stakhanovî, qehremanên planên pênc-salî- van hemûyan kultek nû afirand: kulta keda pîşesaziyê û qurbanîdana bi navê dewletê. “Sosyalîzm” bi projeyên avahîsaziyê yên mezin, destkeftiyên rekorşikêner û serketina li hember paşverûtiyê ve girêdayî bû.

***Encam:*** Sosyalîzm îdeolojiyeke seferberiyê ye. Armanc dike ku modernîzasyonê bileztir bike û hêza dewletê xurt bike, gel li dora partî û rêber bike yek.

***4. Pîvana civakî:*** Hiyerarşî û “Neteweyî”

Tevî diruşmên li ser wekheviyê, sosyalîzma Stalînîst civatek bi hiyerarşiyeke hişk afirand.

***Elîta nû:*** Rêveberiya partiyê, rêveberên kargehan, polîs û astên jorîn ên rewşenbîran çînek nû pêk anî ku xwedî rasyonên xwe yên taybet, xanî û gihîştina feydeyan bûn.

***Gel wekî objeyek kontrolê:*** Girseya karker û cotkarên kolektîf ji mafên rastîn ên grevê, sendîkayên azad, hilbijartina kar û rêxistinên serbixwe bêpar man. Rola wan ew bû ku di makîneya dewletê de bibin çerx.

***Yekîtiya exlaqî û siyasî ya ragihandî:*** Hat ragihandin ku hemû nakokiyên civakî hatin derbaskirin. Têkoşîna çînî niha ne di navbera komên civakî yên di nav Yekîtiya Sovyetê de, lê di navbera “gel” û “dijminên” wan (sabotajker, sîxur, Trotskîst) de dihat meşandin.

***Encam:*** Sosyalîzm civatek hiyerarşîk û dewletparêz e ku wekhevî bi dilsoziya ji bo pergalê û rêber tê guhertin.

***Ji marksîzma klasîk cihêbûna radîkal çi ye?***

Marksîstên klasîk sosyalîzm wekî qonaxa yekemîn a komunîzmê didît. Civak bi keda azad, ku tê de dewlet hin bi hin biçûk dibe, û bi komeleyek hilberînerên azad, aboriyê li ser bingeha demokrasiya berfireh bi rê ve dibe. Stalîn tam berevajî vê yekê difikire. Li gorî wî, ne biçûkbûna dewletê, lê xurtkirina dewletê; ne demokrasî, lê dîktatoriyek totalîter; ne azadkirina kedê, lê mîlîtarîzasyon û îstismara wê ya tund.

Bi vî awayî, “sosyalîzma” Stalîn di rastiyê de şêwazek kapîtalîzma dewletê yan dewletparêziya totalîter bû, ku rola yekane monopola kapîtalîst ji hêla dewleta partiyê û dihat lîstin û retorîka marksîst bi kar dianî, da ku desthilatdarî û polîtîkayên xwe rewa bike.

# Kurd dîroka fermî qebûl nakin



Medenî Ferho



Diroka fermî ya Tirkiyeyê, bi gotina erebî, “suî misal e û nabe misal”, bi kurdî “mînaka xerab e û nabe mînak”!

Em mecbur in dîroka fermî ya Tirkiyê, ji paş ve û berbipaş ve bixwînin: Ev jî wê bibe bingeha naskirina sosyolojiya qirkirinê ya Ziya Gokalp û neynika naskirina paşayên mîratzedeyên Îttîhat Terakkî û xeta nazîst.

Li cîhanê, deriyên dîrokê nayên kilîtkirin; lê dewleta Enqereyê sed û yazdeh sal in, dergehên dîroka jiyanê li ber kurdan kilît kiriye. Di vê serdemê de gelek bûyerên dejenere û kaotîk derketin holê. Armanc jî tunekirina gelê kurd, “deportasyon” [1] û dagirkina erdnîgariya Kurdistanê bû.

Ya balkêş ew e ku “kapîtalîzma enternasyonal” jî, bi hemû hêza xwe, veşarî û aşkere destek da mîlîtarîzma paşayên faşîst. Paşayên Îttîhat Terakkî bûne bavê Hîtler, lê nazîzma Hîtler jî bû bingeha “tirkên nazîst”. [2]

Ewropa naziyên Almanya berteref kirin, lê naziyên tirk destek kirin di qirkirina serdema Şêx Seîd û Dêrsimê de û di dagirkirina Hatayê de hate dîtin ku, dagirkirina erdnîgariya Kurdistanê û qirkirina gelê kurd bi rêbazên klasîk û paşverûtiya sedsala navîn tê kirin.

Tirkên nazîst, destpêkê bi navên “Çeteyên Turkistanî”, “Çeteyên Qefqasî”, “Çeteyên Gûrcî” û “Çeteyên Tatar” dest bi kar kir.

Ev jî dide xuyakirin ku paşayên Îttîhat Terakkiyê, siyaseta avakirina çeteyên serdema qirkirina gelên “xeyrî mislîm”, salên 1909-1921, fêrî faşîstên nazîst û SSan jî kiriye. [3]

Di dîrokê de gihîştina tixubê dawî heye. Tê dîtin û fêhmkirin ku her tişt bi dawî nebûye û li Kurdistanê jî hêza ku parasina gelek tiştan bike heye.

Rêber Abdullah Ocalan, ev rastî dît û dest bi têkoşînê kir.

Piştî şerê nîvsedsalê, kilîdên deriyên dîrokê hatin şikandin, faşîstên mîratzede mecburî dexaleta ber lingê Rêber Apo bûn.

Piştî dexaletê, Rêber Apo, pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk da destpêkirin û li meclisa Enqereyê komîsyona çareseriyê hat avakirin. Salek di ser avakirina komîsyonê re derbas bû û encama salekê jî radestî meclîsê hat kirin. Niha jî, partiya Zafer, ucûbe Umît Ozdag, û partiya Îyî “namusawat” Musavat Derwîşogu, ne di nav de, hemû partiyên klasîk ku bi diruşma “sêva sor” û “faşîzma nazîst” siyasetê dikin, dîtinên xwe, armanca xwe ya li ser pirsa kurdî û çareseriyê bi raporên cuda radestî parlamentoyê dikin.

Ji bilî DEM Partiyê, hemû partiyên klasîk yên bi îdeolojiya fermî û sosyolojiya qirkirinê ya Ziya Gokalp hereket dikin; tiştekî nû nabêjin; dîsa “meşa kuştin û wêrankirinê” didomînin. Bi gotina “dewleta bêteror”, dixwazin kurdan li her derê bêçek û rût, şilf û tazî li holê bihêlin û car din di “gora betonî” de metfûn bikin. Bi taybetî, li dijî Rojava, li dijî destkeftiyên şoreşa bi derdêlên giranbuha ya gelan hatiye pêkanîn, di nav liv û tevgerê de ne. Dewşirmeyên nazîst qîran didin û dixwazin Şoreşa Gelan a li Rojava radestî însafa çeteyên paramîlîter û bermayiyên DAIŞê bikin.

Her çiqas di dîroka dewleta Enqereyê de, yekemîn car e, li meclisê û bi armanca çareseriya pirsa kurdî “komisyonek” hatibe avakirin; yekemîn car, lîderê kurd muxatab hatibe girtin û bi Rêber Apo re hevdîtin hatib kirin jî, rojane û di çarçoveya nijadperestiyê de, surprîzên nû derdikevin holê.

Ev xeta sor a dewleta otorîter û felsefeya “vesf û normên yekyekan” e ku bi sosyolojiya qirkirinê ya Ziya Gokalp hatiye avakirin û bi destê “nazîstên tirk” tê meşandin. Gelo ev surprîzên kaotîk ku baweriya gelê kurd têk dibin; yek, bela ”komên mafîyoz“ e; du, bela ‘‘komên terorîst” ên “naziyên tirk”e; sê, bela çeteyên JITEM û Gladyoyê ye; çar, yan bela çeteyên paramîlîter e ku bi destê dewleta Enqereyê hatine avakirin?

Hemû bask jî, berhemên “Teşkîlatî Mahsûsa” ne ku bi pêşengiya Enver Paşa hatin avakirin û bi serokatiya Mustafa Kemal hatine bihêzkirin. Piştî salên 1940î, SSên misilman ketin nav tevgerê. [4]

Diruşma ‘‘li welat aştî, li cîhanê aştî“ tenê ji bo petro-polîtîkayê, li dijî komunîzm û kurdîtiyê hat bikaranîn.

Gotina ‘‘Tirkiyeya bêteror” ku îro di pêvejoya çareseriya civaka demokratîk de tê bikaranîn jî, bi heman wateyê tê bikaranîn. Kurd jî wateya vê diruşmê baş dizanin û di şerê cîhanê yê 3yemîn de, bi bîr û têgihîştina diyalektîka serdemê, di radeya SOSê de hereket dikin.

Kurd jî, eniya demokratîk a şiyar jî baş dizanin ku ruhê Talat Paşa, di nav tevgerê de ye. Her çiqas gotina kemalîzmê were bikaranîn jî, di her hal û karî de “sêva sor” zindî ye û cîhada şerê taybet jî, geh bi rêya çeteyên paramîlîter, geh bi şerê xeyrî nîzamî tê meşandin.

Ev siyaseta “deportasyon”ê ye; hem derxistina gelê kurd ji dîrokê, hem dorpêçkirina mîlîtarîst a erdnîgariya Kurdistanê ye. Ev dorpêç, bi qanûnên polayî û qedexe, bi mandelekirin-înkara nasname, ziman û çandê tê meşandin.

Tevî ku salek di ser komisyona çareseriya pirsa kurdî re derbas bûye jî, yek, zimanê kurdî hîna qedexe ye; du, tecrîda li ser Rêber Apo dewam dike; sê, dîlên azadiyê, nexweş, siyasetmedar û hevşaredar jî di nav de, yek kes nehatiye berdan, înfaz bûye dîwarê tunekirinê; çar, “Cîns gef”ên li ser gelê kurd, medya kurdî, rojnamevan û nivîskarên kurd jî dewam dikin.

Kurd, dibînin û dizanin; desthilatdariya AKP-MHPê, dixwazin “dewleta bêteror”, weke cîhada “sêva sor” bi kar bînin. Bi vî awayî, hem kurdan bê deng bikin, ji mafên demokratîk dûr bikin, hem li Rojhilata Navîn, Asya, Efrîqa û Ewropayê serkeftinan bi dest bixin.

Lewma di siyaseta herêmê û cîhanê de, Teşkîlata Dewletên Tirk, karsaziya şer bi kar tînin; di dîplomasiyê de jî çakûçê xwe hem li sidan didin, hem li hesin didin!

Kurd êdî destûrê nadin ku dewleta Enqereyê, bi hişmendiya nijadperest, tûranîst, nazîst û îslama sêva sor derkevin futuhata Kurdistanê.

Filozofê amerîkî George Santayana dibêje; “Kesên ku pêşerojan ji bîr bikin, mahkûmê wan rojan dibin.” Vêca kurd, hem dîroka xwe dizanin, hem pêşerojên tijî bûyerên kaotîk û dejenere di bîra wan de ne û hem dîroka dijmin dizanin, hem jî dek û dolab, xap û ripên dijmin jî di bîra wan de ne.

***

**1-**Deportasyon, bi zorê koçberkirin-dersînorkirina xwediyê cih- welatiyan e...Valakirina welat ji ehlê cih e.


**2-** Naziyên tirk, bi pêşengiya îdeologê nazîst Dr. Ernest Voerman û rêxistina Ciwanên Elmanya, bi diruşma avakirina “dewleta turan” derketin holê. Paşayên desthilatdar ên dewleta Enqereyê jî ew bi hemû hêza xwe destek kirin.

**3-** Paşayên Îttîhat Terakkî, di serdema qirikirina gelên ermen, rûm, suryan û kurd de, diz û kujerên ji girtîgehan derxistin, weke çeteyên paramîlîter, bi navê “Gîzîr”, “El Xemsîn”, “Tabûrên Kasaban”, “Çerkez”, “Kêrd” û hwd. avakirin û êrîşî gelan kirin.

**4-** SSên misilman, ‘‘Rêxistina Biratiyê“ ava kirin û tekîliya Hîtler û Şef Îsmet Înonû xurt kirin. Piştre, di nav artêşa tirk de bi hêz bûn, ligel faşîstên weke Sakalli Nureddîn Paşa, nazîstên weke General Mustafa Muglali jî zêde bûn...

# Dewleta laşxwir; Tirkiye!

Di civîna bilind a li Dohaya paytexta Qeterê ku 16ê kanûna 2025an pêk hat, Tirkiye nehat vexwendin. Zedetirî 45 welat beşdarî vê civînê bûn û ev welatan hemû wê di nav hêzên aramkirina Xezayê de cihê xwe bigirin, lê Tirkiye tê de nîne



Ahmet Aktaş

Vê carê jî çavên xwe berdaye laşê Xezayê û bi hemû hêza xwe dixebite, da ku ji vê malxirabiyê xenîmetên herî mezin ew bidest bixe.

Ev tebîet û exlaqê li dijî mirovahiyê, ji zihniyeta dewletên tirkan ên dîrokî tê. Ji wan re tê gotin hêzên şerker û xwînrij ên li ser hespan ku karê wan; talan e, wêran e û qirkirin e. Li nav gel ji van hêzan re tê gotin; mîna qertelên li laşan digerin, bi gotineke din; ev qertelên laşxwir in!

Em ji dîrokê vegerin bala xwe bidin vê serdêmê, em dibînin ku li kîjan deverê, li kîjan welatî gumana şer hebe, hema bi lez hewl dide ji bo ku beşdar bibe û şer gur bike. Her wiha cihê ku şer û pevçûnê des pê kiribe, hema li rêyên beşdarbûnê digere da ku şer gurtir bike û dîsa para herî gir û berfireh ew bixe destê xwe û heke derfet hebe, êdî yekcar ji wir dernekeve û wê herêma dagirkirî bixe nav sînorên dewleta xwe; mînaka Rojava û Sûriyeyê li ber çavan e.

Mînakên berî vêya; hema mirov dikare ji Qibrisê des pê bike biçe Afganistanê û derbasî Iraqê bibe, ji wir biçe Libya û Qerebaxa di navbera Ermenistan û Azerbeycanê de, û were heta îro ser laşê Xezaya reben û belengaz! Helbet dema dixwaze biçe van welatan an deverên gumana xurt a laşxwariyê heye, durûtiyeke rûreş dike û dibêje 'ez ji bo xêrxwaziyê û li ser daxwazê vê dikim!'

Her wiha ji bo çûyîna hinek cih û welatan ên taybetiyên wan ên cuda yên mîna tirktî û misilmantiyê hene jî, van gotinan li sedemên çûyîna xwe  zêde dikin û dibêjin 'em dixwazin, ji bo rizgarkirina tirkan û misilmantiyê biçin û van deveran azad bikin' û hwd.

Weke mînak, sedema çûyîna Qibrisê bi giranî tirktî bû, paşê misilmantî jî lê zêde kir, her wiha ev ji bo sedema çûyîna Qerebax, Iraq û Sûriyeyê jî nîşan dan. Lê sedema çûyîna Afganistan, Libyayê û hwd. bi giranî bi misilmantiyê nîşan didan. Îcar, ka em bala xwe bidin mijara sereke ya rojane ya Xezayê.

Bêguman sedema daxwaza çûyîna xwe ya vê herêmê jî, wek misilmantî û hinek jî mirovatî nîşan didin. Lê belê weke nîşandana sedemên welat û herêmên din, sedema wan a Xezayê jî derew e. Rastiya wan ne ev e, rastiya wan; berjewendiyên bazirganiya wan e û her wiha ji bo bangeşiya (propaganda) hundurîn û derveyî ya xapandinê ye.



Lê, wisa diyar dibe ku vê carê şansê wan ê qezenckirinê yê mîna hinek cihên din nîne. Ji ber ku kelemê derketiye pêşiya wan dijwar e; Îsraîl ku dijberiya xwe ya Tirkiyeyê aşkere dike. Li gorî tê xuyakirin û weke di civîna bilind a Qeterê de jî tê diyarkirin, Tirkiye wê vê carê negihîje armancên xwe yên laşxwarinê. Di civîna bilind a li Dohaya paytexta Qeterê ku 16ê kanûna 2025an pêk hat, Tirkiye nehat vexwendin.

Zedetirî 45 welat beşdarî vê civînê bûn û ev welat hemû wê di nav hêzên aramkirina Xezayê de cihê xwe bigirin, lê Tirkiye tê de nîne. Li gorî ku rojnameya Haaretzê ya Îsrailê dibêje, li ser daxwaza Îsraîlê, CENTCOM a girêdayî DYAyê ku ev civîna mezin amade kiribû, Tirkiye beşdar nekiriye.

Li gel ku Tom Barrack, hewl dide Netanyahû razî bike ji bo Tirkiye jî beşdarî vê hêza aramker û seqamger a Xezayê bibe, lê heta niha hîn bi ser neketiye.

Berevajî, Netanyahû biryar daye û hewl dide ku bi rêberên Yewnanistan û Qibrisê re civînek bilind a sêalî li dar bixe!

Dewleta tirk û hevalbendên xwe, ji sed salî zêdetir e ku li ser axa pîroz a Kurdistanê laşxwariyê dikin, lê ji niha û pêde êdî wê nikaribin bi rehetî û hêsanî laşxwariyê bikin. Ji ber ku êdî teyrên baz û şêrên leheng ên Kurdistanê, bi pêşengiya Rêberê xwe li ser piyan e û bersiva wan bi qehremanî didin û serkeftin, wê ya baz û şêrên Kurdistanê be!

---

**Daxistan Payçû**

# Nêrîneke cuda li girîngiya ziman

Mirovan di dîrokê de li gorî taybetmendiyên dema xwe, xwe ji aliyê çand û civakî ve anîne ziman, jiyana xwe domandine. Ji aliyê çanda heyberî ve her dem li gorî taybetmendiyên xwe ye. Rastiyek heye ku ziman hemû deman xwedî girîngiya sereke ye û di domandina wate û çanda heyberî de amûra sereke ye. Lê di demên cuda yên dîrokê de çanda heyberî bi awayên cuda reng û wateyên xwe didin der. Ev di nav xwezayê de cudahî û taybetmendiyên xwe diparêze. Wekî mînak, ji bo nêçîrvanan totem nîşaneyên hebûn û wateyî ne; ji bo hozanan piranî cil û berg xwedî taybetmendiyên cuda, rengîn û wateyî ne. Giraniya hozanan bi cil û bergên tên nasîn. Ew awayên debara jiyanê jî diyar dikin. Dîsa ev awa, nasnameya çand û civakê jî diyar dike. Di serdemên dêrîn de, ev xweserî bi rengên baweriyên paganîk, perestgeh û avahîsaziyên li gorî wan dertên pêş û bandora xwe li heyama navîn jî dikin. Nasnameyên çandî û civakî piranî ev in ku ber bi bajarvaniya heyama navîn ve jî diçe. Di heyama navîn de nasnameya sereke bawerî (yekxwedayî) ye. Cudahî piranî wekî mezheb xwe di nav vê nasnameya sereke de dibînin. Ziman bi awayekî xwezayî amûra ragihandinê ye. Ji vê wêdetir zêde li ber çavan nayê girtin. Bandora erebî ya ku gelên pêvek wateya wî nizanin bes pîroz dibînin, mînaka sereke ya vê rewşê ye. Yê girîng zimanê sereke yê qesrê ye ku ew jî bandora xwe li netewe-dewletan dike.

Hewla sanayiyê ya ji sedsala 19emîn pê ve û ji nîveka duyemîn a sedsala 20î pê ve jî hewla heyama teknolojî û fezayê, hemû ev taybetmendiyên çanda heyberî ji holê rakirin. Ji vana hinek bi dinyaya global re ket ber çerxên endustriya têkel û jixweber (di rastiyê de plankirî ye) ji holê rabûn, hinek jî wekî ku hat serê gelê kurd, ji aliyê netewe-dewletan ve bi şerên qirêj û planên bi vî awayî pêk hatin.

Netewedewletan gel, bawerî û hindikahiyên di bin bandora xwe de bi vî awayî têk birin, pergala emperyal a sereke jî bi demê re netewe-dewlet jê birin (ev pêvajo didome) û ew ber bi holdîngên fermî û hiqûqî ve veguhertin. Ji ber van sedeman çanda heyberî, ew cihêtî û cudahiyên dîrokî ku gelan, rengan baweri û çandan pê xwe didan jiyandin, ji holê rabûn.

Îro ji cil û bergan bigire heta avahîsaziyan, ji xwarin û vexwarinê heta awayê jiyanê hemû dinya ber bi yekrengiyê ve diçin. Lê ev yekrengî bi awayê erênî na, bi awayê neyînî pêk tê. Di roja me de yek tiştekî dimîne ku cudahî, taybetmendî, reng û dengên gelan bide jiyîn: ew jî ziman e. Girîngiya ziman îro ji bo hemû gelan xwe dide der û ji bo netewe-dewletan jî wisa ye. Lê ji bo gelên wekî gelê kurd ku îro xwedî sazî û dezgehên neteweyî nînin, ev girîngî di wateya man û nemanê de ye! Di roja me de ku hemû alavên çanda heyberî ji cihekî (endusriyalîzm-têkel)




ve li hemû dinyayê tên belavkirin, ziman hêmana sereke ya xwejiyandina gel, reng û dengên cuda ye! Baweriyên ku wateyên xwe ji dest dane nikarin vê pêşwazî bikin. Jixwe taybetmendiyên sereke yên pişaftinê ne ku hîna ji heyama navîn mane.

Dibe ku sibê mirovahî yan jî civak xwe bi awayên cuda binasînin. Ev pirsgirêka mirovahiyê ye û bi rêveçûna mirovahiyê ve girêdayî ye. Lê  îro ziman li hemberî mirinê jiyan e! Ji bo gelekî din xwedî girîngiyekê be, ji bo gelê kurd xwedî hezar girîngî ye. Ji bilî zimanê kurdî îro tiştekê ku kurd hebûna xwe pê biparêzin nemaye. Di serî de şîn û şahî, taybetmendiyên çanda heyberî ya gelê kurd li dinyayê sereke ye. Lê civaka kurd bi tenê vana di meriyetê de dijî û li ser wate, dîrok û felsefeya wan têr nasekine. Ku wiha bidome, dê gêjbîniyek xwe bide der û xetere heye ku piştî qirneyek du qirneyên din, ev jî di meriyetê de jî ji holê rabin. Bi tenê yek çekeke gelê kurd maye ku hebûna xwe bide jiyîn: zimanê kurdî! Wekî nexweşek li ber mirinê ku yek dermanekî dikare wî vegerîne jiyanê. Ew jî zimanê kurdî ye. Civaka kurd divê ku li ser vana hûr û kûr bifikire.

Mîtolojiya qewmê Ad heye. Xwedî li exlaqê xwe dernayê û ji hêla Xwedê ve ji holê tê rakirin. Mîtolojî wisa ye. Lê divê ku gelê kurd vê baş bizanibe ku bingeha exlaq jî ziman e. Mirov an jî civaka ku xwedî li zimanê xwe derneyê, nikare xwedî li ti tiştekî xwe derkeve! Ew dê xwe bixwe xwe ji holê bide rakirin.

Îro dayik û bavên kurd ku bi zarokên xwe re bi kurdî napeyivin û kurdî hînî wan nakin, li hemberî hemû pîvanên kurdewar ên bi hezaran salî bi berdêlên bêhempa hatin afirandin, îro û pêşerojê şermî û sûcdar in! Yek çekeke me ya kurdan maye ku em xwe wekî gel bidin jiyîn; ziman. Ziman, bi xîretê, bi zanînê, bi hewldanan dikare were jiyandin. Ev berpirsyariya her kesayetiyek kurda/ê bi xîret, xwedî zanîn û exlaq e. Îro ji bo nîşandana vana ji hemû deman zêdetir derfet hene. Ji bo bikaranîna van derfetan xîret divê, zanîn divê, exlaq divê û vegera ser rewşa xwe ya xwezayî divê. Divê em bi kurdî bifikirin, bi kurdî hîs bikin, bi kurdî bipeyîvin, bi kurdî bixwînin û bi kurdî binivîsin. Ji bo ku ev çiya, ev dar û ber, ev ax, ev welat, ev çand, ev dîrok bê nav û nîşan, sêwî û bêxwedî nemînin.

# Gurgum ra heta Sûrîye: Birîna ke nêvindena

Birîna Gurgumî hîna akerde ya û heta ke hesabê qirkerdişî nêdîyo, na birîne nêvindena û ewro, wezîfeyê ma yo tewr gird o yo ke, ma vengê elewîyanê Sûrîye bibê û nêverdê ke tarîxê qirkerdişî newe ra binusîyo. Vîrakerdiş xiyanet o

| Merkezê Xeberan

Tarîxê merdimayîye de tayê rojî estê ke, ê rojî tenya teqwîm de yew hûmare nîyê; ê rojî nîşanê dejî, şînî û birînanê xorînan ê. 19ê Kanûna 1978î zî tarîxê kurdan û elewîyan de rojêka winayîn a. Na roje, destpêkê Qirkerdişê Gurgumî/Mereş ya. Labelê no qirkerdiş, tenya serebûtêko tarîxî nîyo; no zîhnîyet ewro zî cografyaya Rojhelatê Mîyanênî de, xusûsen Sûrîye de ganî yo û vera komelê elewîyan de gefanê girdan waneno. Ma nê nuşteyî de, hem Qirkerdişê Gurgumî ser o vindernê hem zî bala wendoxan anê serê rewşa xofîne ya ke ewro Sûrîye de qewimîyena.

**Gurgum: Hewteyêko gonîn**

19ê Kanûna 1978î de, şaristanê Gurgumî de game bi game planêkê qirkerdişî kewt dewre. Çîyo ke ameyne kerdene, yew şerê mîyanê şarî nêbi; no yew operasyonê "paqijkerdişê etnîk û dînî" bi. Hêzanê tarîyan, bi organîzasyonê dewleta xorîne û bi destê faşîstanê sivîlan, dest bi hêrişê vera elewîyan û çepgîran kerd.

Verî ke qirkerdiş dest pêbikero, keyeyê elewîyan bi boyaxa sûr ameybî îşaret kerdene. Dima ra, 24ê Kanûne de hêrişê girdî dest pêkerd. Kûçeyanê Gurgumî de cinîyî, domanî, kokimî û ciwanî bê ferqkerdiş ameyî qetil kerdene. Goreyê malumatê fermîyî, 111 kesî ameyî kiştene, la goreyê şahîdanê cematî û çimeyanê bînan, hûmara kişteyan bi seyan bîye. Cinîyê ke digan bîyî, pîzeyê înan ame akerdene; domanî verê çimanê mayan û pîyanê xo de ameyî letekerdene.




No wehşet de armancê esasî, Gurgum ra vetişê kurdan û elewîyan bi. Nê planî de zî ser kewtî. Qirkerdişî ra dima, bi hezaran keyeyê elewîyan mecbur mendî ke erdê xo û keyeyanê xo ca veradê û koçê şaristananê bînan yan zî Ewropa bikerê. Gurgum, demografîya xo vurna û bî yew şaristanêkê tirk-îslamî.

**Zîhnîyetê Yezîdî û serebûtê ewroyî**

Merdim şîkîno vajo ke "Gurgum tarîx de mend." Labelê rastîya cografyaya ma wina nîya. Zîhnîyetê ke 1978 de Gurgum de "Allahuekber" vatêne û sereyê merdiman birnayêne, ewro Sûrîye de bi nameyê cîya-cîya yê sey DAIŞ, El-Nusra û grûbê bînî yê cîhadîstan vejîyeno meydan.

Şerê Sivîlî yê Sûrîye ke 2011 de dest pêkerd, demêko kilm de bî şerê mezheban. Çeteyê selefî û cîhadîstî, elewîyanê Sûrîye (Nusayrîyan) sey "kafir" dîyî û "qetilkerdişê înan helal" dîyî. Tiya de nuqteyêka muhîme esta: Zîhnîyetê ke Gurgum de kîşitêne û o ke ewro Lazqîye, Heleb û Şam de hêrişê dewanê elewîyan keno, eynî zîhnîyet o.

Taybetî ewro, badê ke şerê Sûrîye newe ra gûre bi, grûbê çekdarî yê ke hetê hêzanê mîyanneteweyî û herêmîyan ra paştî gênê, reyna dewanê elewîyan kenê hedef. Raporê rêxistinanê heqanê merdiman nîşan danê ke, nê çeteyî şinê dewan, camêrdan û ciwanan kişenê, cinîyan sey "ganîmet" gênê û şarî mecbur kenê ke dînê xo bivurnê.

Sûrîye de elewîyî, seke Gurgum de ameybî dorpêç kerdene, ewro zî binê dorpêçêka girdî de yê. Tirsa înan a tewr girde a ya ke, senî ke Gurgum de cîranî cîranê xo kişt, Sûrîye de zî eynî felaket biqewimîyo. Nê hêzê tarîyî wazenê ke cografyaya Rojhelatê Mîyanênî ra renganê cîyayan, bawerîyanê qedîman û kulturê pîya-ciwîyayîş awan bikerê.

**Vîrakerdiş xiyanet o**

19ê Kanûne de vîrardişê Qirkerdişê Gurgumî, tenya yadkerdişê merdiman nîyo; no eynî wext de yew çalakîya xoverdayîşî ya. Eke ma tarîxê xo vîrî ra bikerê, ma do mehkûmê tekrarê ci bibê.

Gurgum ra heta Çorumî, Sêwas ra heta Gazî û ewro zî Sûrîye de, zincîreya qirkerdişan dewam kena. Hedefê nê hêrişan tenya canê merdiman nîyo; hedef hafizaya ma, bawerîya ma û estbîyayîşê ma yo. Seba ke ma nê wehşetî reyna nêvînê, ganî ma hîşyar bî.

Elewîyê ke ewro cîhan de yê, ganî nêbê bêveng vera zulmê ke Sûrîye de yeno kerdene. Elewîyê kirmancî/zazayî, kurmancî û tirkî, ganî dest bidê yewbînan û vera nê zîhnîyetê "faşîstî" de yewbîyayîşê xo xurt bikerê. Çike êyê ke ewro Sûrîye de serebirnenê, eke firsend bibînê, do eynî çî Gurgum de, Dêrsim de, Meletî de Erzîngan de zî bikerê.

Ma şehîdanê Gurgumî bi hurmet yad kenê. Ma vanê ke; birîna Gurgumî hîna akerde ya û heta ke hesabê qirkerdişî nêdîyo, na birîne nêewîyena. Û ewro, wezîfeyê ma yo tewr gird o yo ke, ma vengê elewîyanê Sûrîye bibê û nêverdê ke tarîxê qirkerdişî newe ra binusîyo. Vîrakerdiş xiyanet o. Ma nêvîrnenê, ma nêdanê vîrakerdene.

---

# Kitabê 'Raywanê Heqîqete' vejîya

| Lêl AMED

Nuştox Mehmet Zahar Oluk o ke kurdkî (kurmancî, kirmanckî/zazakî) ser o xebat keno, kitabê ey ê hîkayan ê zazakî Raywanê Heqîqete vejîya. Kitabo ke Weşanxaneyê J&J ra vejîya, yew "vatêyo verên" û şeş hîkayan ra yeno pê.

**Mehmet Zahar Oluk Kam o?**

Serra 1981 de, dewa Hacîyan a Kanîreşê Çewlîgî de, ame dinya. Semedê xebatanê xo yê sîyasîyan ra serra 2016 de ame tepiştene û heşt serrî zîndan de mend. Zîndan de kurdkî (kurmancî û kirmanckî/zazakî) ser o xebat kerd û hema zî xebatanê xo yê ziwanî rameno.

Mehmet Zahar Oluk xebata xo wina dano şinasnayene: "Ma çi wext behsê ziwanî kenê, çekuya ma ya verêne 'ziwanê dayîke' ya, ma vanê! Coka hewceyîya averberdişê ziwanî zî esta. Na rewşî de verpirsîyarîya herkesî est a. Ciwîyayîşê ziwanî ciwîyayîşê şarî yo; ganî merdim ziwanê dayîka xo reyde gandar bibo. Ziwan zî gandar o. Çiqas bêro nuştene û wendene, wina şuxilîyeno. Senî ke şitil heşînbîyayîşê xo awe ra gêno, ziwan zî wendiş û nuştiş ra gandar beno. Na verpirsîyarîye mi dest bi nuştişê kirmanckî kerd.

Wextêko derg û hîra ziwanî ser o mi xebat kerd. Mi waşt na xebata xo bi rayîrê nuştişî domdare bikerî. Xora, mîyanê deryayê çekuyan de, her çekuyêke fîraz ameyêne mi ver. Nuştişê her çekuye kelecanêko gird dayêne mi. Çimke ziwanê ma sey şitê dayîka mi weş ameyêne.

Yeno vatiş ke, 'Her nebat/vaş erdê xo ser o heşîn beno!' Eke nebat û dar, erd û koka xo ra bivîsîyo û manaya estbîyayîşê xo vindî bikero, wuşk beno. Eynî çî seba komelî zî vîyarte yo. Şarêko nasnameyê xo ra bivîsîyo û bêro dûrvistiş, beno xerîb, raştîya xo ra zî visîyeno; kamîya estbîyayîşê heqîqetê ey zî çîn bena. Nuştişê mi yê nê kitabî zî mîyanê deryayî de bîyayîşê çilkêke yo.

Nuştişê kitabî de amancê mi yew no bi. Reyna, xoverdayîşê şarê ma de, xeylêk keyna û lajê ma yê tîtalî, canêdîgerî, bi xasekîya emrê xo yê tewr rindî, bîyî cangorî. Mi waşt, nîmeyê nê qehremananê şarê xo, bi rayîrê nuştişî dekerî mîyanê rîpelanê tarîxî. Nameyê kitabî zî bi nê şiklî na ci ra: RAYWANÊ HEQÎQETE.

Vatêyo verên û şeş hîkayeyî estê. Vatêyo verên nuşteyêka sazûmanî ya; fikrê xoverdayîşê cangorîyanê ma mi waşt bi îzahato felsefîk ca bikerî. Reyna, şeş hîkayeyî estê. Her yew hîkaye de trajedîyêka şarê ma nusîyaya. Mi nuştişê xo de na çî ferq kerd ke çiqas biwaştêne, nuştişê mi de huyayîş nênusîyeno. Dejê ma kamcîn het de bi, qelema mi a hete ser o şuxilîya. Ez bawer kena ke wendoxê ma ci ra îstîfade vînenê."

**Kitab ra seba wendoxan pasajêk:**

"Bînayê newe herînda înan de bîyî berz, darîstanêko/bîrêko bêtonîn bî. Bê bêton û bînayê serdînê panc, şeş qatan çîyêk çînebî. Bajaro kehen yo hezaran serran şanabî we, bî bînayanê tît û vîtinan rê bajar şorax kerdîbîy. Bajar û tarîxê şarî de lej amebî kerdîş. Na rewş vêrê çimanê her di Bi rayan de bî. Dûrî ra ewnîyêne herinda kuçe û keyê xo ra; çiheyf ke, çîyên nêmendibi! Hestê înan gîrîyaybî. Her di bîbî hestîyar, kilêk eştibî zerrîya înan, sey cêrzemînan veşayîbî. Ferat destê xo hetê kuçe û keyê xo vêrînî rê kerd derg nîşanê Azad da û vat;

"Çi qîyamet bî ke ardî şar û bajarî ser. Mîyanê panc serran de bajarêk senî wîna bedilyeno!?.. Merdim bi çimanê xo nêvîno, na rewşê ra bawer nîkeno. Tarîxwan semede Asur û Moxolan vanî; 'sey birrê kulîyan/meşe ser şar û şarîstanî ra vîyartî 'u talan kerdî.' La belê torinê Moxolan, des game kalîkanê xo vîyartî. Mîhît, mezel û xoza de zî lej û talan kerdî!"




# Halê ma û ziwanê ma

Muhîttîn Altun

Kirdkî ha bindê tehdîdê çinîbîyişî de ya. Kerm û kêzê asîmîlasyoni gan û goştê ziwanê ma kojenê. Roj ra roj kateyanê ziwandê ma veceno werte. Ek no hewa dewam bikero zaf nêşino kirdkî bena kateyê raq û rutî, manena.

Gerek nêkeno ki UNESCO raporan binûso. Gerek nêkeno cigeyrayişê zanyarî bêrê kerdene. Ma der û dormareyê xo ra biewnê, ma bi çimandê xo veynenê. Ma keyeyandê xo di veynenê. Ma xo di veynenê. Ma tewr zaf zî xo di veynenê.

Ziwanê ma firî ra firî şino apey. Ma sey mayan û pîrandê xo nêzanê kirdkî qise bikerê. "Ma" ra qestê mi; kirdê pancas serreyî û yê inan ra bineyna pîl ê. Kirdkîya ma sey kirdkîya înan ganî, zengîn, herikbar û weş nîya. Meylê way û birayê ma yê ma ra şinikêrî, ma vajê emrê înan beyntarê hîris û pancas de yo, hinîya zaf tirkî ser o yo. Way û birayê ma yê ki emrê înan mabeynê pancês û hîris de yo, kirdkî di bineyna apeykewte yê. Zafinê înan kirdkî fam kenê, la nêeşkenê xo rind îfade bikerê. Ziwanê înan-qewlê verînandê ma- ziwanêdo nêrkî yo. Domanê ma yê ki emrê înan bindê pancêsî ra yo, meylê xo tadawo tirkî ser. Hema vajê qet kirdkî nêzanê. Zaf zaf tayê înan kirdkî zanê.

Mayan û pîyanê ma, ma musnayê kirdkî. Ma înan ra banderê kirdkî bîyê. La ma nêeşkenê tutanê xo bimusnê ziwanê xo. Tutê ma nêeşkenê banderê ziwandê xo bibê. Ziwanê ma timî mewzî vindî keno. Timî xo anceno apey. Cayê ziwanê ma, ziwanê şarê serdestî dekeno.

Tabîet vengone ra hez nêkeno. Heyat vengone qabul nêkeno. Vengone yew tewir debeno. Vengoneyê ma şar dekeno. Hinî wina bîyo ki, pîr û kalikê ma ziwanê tornanê xo ra fam nêkenê. Tornî, ziwanê dapîr û bawkalanê xo ra fam nêkenê. Vanê: "Dede, nîne konuşmayı bilmiyor", vanê "Diyorlar vin vin", vanê: " Nîne, dede güzel konuş". Çimê tutandê ma di ziwanê ma bîyo "Vin vin", bîyo vengê bêmaneyî. Bîyo ziwanê nezanan. Bîyo "Güzel olmayan konuşma". Ma hinî nêzanê ki ma ronişê halê xo rê bibermê, nê ma nekanê xo vecê bi halê xo bihuyê.

Vîş ra kêm wazîyetê ma û ziwanê ma no yo. Vanê ; "Ziwan, keyeyê estbîyişî yo."


Ek ona ya ma eşkenê vajê ki; keyeyê estbîyişê ma ha emerîyeno, ha xerepîno, ha yeno war. Wayerê ney keyeyî roj ra roj ney keyeyî ra teber kewenê. Ci rê wayerîyi nêkenê. Keyeyê estbîyişê ma ha beno xano xirabe. Ziwano bêwayer xano xirabe yo, rezo kewte yo.

Ez çewî sucdar nêkena. Şart û şurudê ma û ziwandê ma yê tarîxî û sîyasî beylû yê. Serdestan feraset nêdawo ma û ziwandê ma. Destê xo yo asinên, tuncên kerdo qirikda ziwanê ma. Cif bi ziwanê ma ro peysnayo. Ziwanê ma kuto, kişto. Qet rayer nêdawo ziwanê ma. La serdest çihinday bêmerhemet bo, çihinday pîzeyê xo bi ma û ziwanê ma nêveşno zî, yew sindorê quwetê ci esto.

Eger ma bineyna xo û ziwandê xo di israr bikerdinê, ma nêvatinê: "Wa pitê ma banderê tirkî bê, nê ki mekteb di embazandê xo ra apey manenê" belkî eyrû wezîyet ihinday trajîk nêbîynî. Domanî mekteb di, kuçe û çarşu di bikewê bindê bandira tirkî zî, ma keye di înan reyra kirdkî qise bikerdinê, cewabê înan kirdkî bidayinê belkî wazîyet bineyna rind bibîynî. Kilma qale, wabal û mesûlîyetê ma zî tay nîyo.

Ma bêhêvî nêbê. Wa hêvî û omidê ma bibo. Hima peynî ma nêameya. Ma hima nêmerdê. Ziwanê ma hima xo teslîmê gangîrî nêkerdo. Belkî zeîf bîyo. Belkî kateyê ci vecîyayê. La hima esto. Hima omideya xo, xo ra nêbirnaya.

Hima teselîya xo ma ra nêvista. Hima zî seba ma û ziwandê ma yew hêvî esta. Eke ki ma kirdî; bineykî pelanê xo biweşanê, biney xo vero bidê, biney xîret bikerê belkî ma bieşkê des pancês serran mîyan di na pêla asîmîlasyoni ziwanê xo ser ra bidê kinare. La eger ma bi mergê xo û ziwandê xo razî bibê, ma vajê: "Qederê ma û ziwandê ma no yo" aqubeta ma û ziwandê ma beylu ya. Hêvîya ziwandê ma, ma ra vîş çewna nîyo. Hevîya ma heyna ma yê.




# Tiştanok

Gelî hêjayan mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd in ku berê di civat û şevbuhêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1- Mamê mino***
Tiştek heye
Gelek diranên wî hene lê gez nake.
Ew çi ye gelo?

***2- Mamê mino***
Tiştek heye bê bask difire.
De beje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
**1** - Şeh **2** - Deng

# Ma dinya xerabû!

**Miradê Zer**


Miradê Zer dîsa serê sibehê xwe amade kir ku biçe kar. Dayika wî jê re got, ‘Kurê min tu dîsa bê taştê çûyî. Hevjîna te keça zaliman ji xew ranabe û taştê nade ber te.’ Mirad got; ‘Dayê serê vê sibehê madê kê dibije taştê, ez li şaredariyê taştê dixwim.’ Dayê pirsî, ‘Kurê min ma tu li şaredariyê çi karî dikî.’

Miradê Zer got, ‘Li şaredariyê li çayxaneyê dixebitim û bi taybetî li ber destê hevserokan diçim û têm ji wan re taşêya wan amade dikim û ji mêvanên wan re çayê û qehweyê pêşkeş dikim.’

Dayê got, ‘Ha wisa be baş e, nexwe tu bi şaredaran re taştêya xwe dixwî.’ Mirad got, ‘Na dayê ez li çayxaneyê hema li ser lingan gezek simît dixwim.’ Dayê, ‘Ma şaredarên we simîtan dixwin.’ Mirad, ‘Na dayê ez ji wan re penêr, zeytûn, hingiv, qeymax, qelî û melemenê çêdikim.’



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Ne dûr ***5-*** Pêvek ***7-*** Find ***8-*** Daçek ***9-*** Hawar ***13-*** Hezkirin ***14-*** Ji niha şûnde ***16-*** Endamekî rûyê mirov ***19-*** Şûna lêdanê, di encama qezayê de tiştên ku di laşê mirov de çêdibe ***20-*** Cejin ***21-*** Xebat ***22-*** Roj ***25-*** Agir ***26-*** Bajarekî bakurê Kurdistanê. ***28-*** Bajarekî rojavayê Kurdistanê

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Dijminatî, dijîtî
***2-*** Ji bo çi
***3-*** Bersiva neyînî
***4-*** Rengek
***6-*** Beroşa mezin a xwarinê
***10-*** Nuqte
***11-*** Axîn
***12-*** Fêkiyek
***15-*** Tiştê afirandî
***17-*** Xizmekî pir nêz
***18-*** Pêvajoyeke perwerdeyê, merhele
***20-*** Avahîsazî
***23-*** Îrade
***24-*** Herêmeke Tirkiyeyê
***27-*** Rojeke hefteyê

## Bersiva hefteya borî





Şêx Zubêrê Kurdî

# Silaveke germ ji dilekî bi kul û kovan

*Silav gelî xwînerên xwînşêrîn!*
*Bi evîneke kûr û dêrîn*
*Wekî welatekî xweş û berîn*
*Ez dîsa dibêjim merheba!*

Her wekî me berê jî di nivîsên xwe de bi palpişta helbestkarê me yê klasîk Axayok dabû xuyakirin, berî kelamê selam e. Piştî navbereke dûvedirêj em dîsa bi hev re ne. Em dizanin ku xwînerên Xwebûnê hemû berî çend salan xwînerên Azadiya Welatî bûn. Lê mixabin xêrnexwazan qufle li deryê Azadiya Welatî da, lewma jî em ê ji niha pê ve li vê derê hasbîhal bikin.

Di van çend salan de çi hat serê me Xwedê dizane, rih û simbêlên şêx û meleyan dan ber kêr û gûzanan, bi hinceta ku ji Meleyê Derewîn re naçin şejdeyê. Hinekan got, mezhebê şafiyan betal e, werin ser mezhebê henîfiyan. Ji ber ku li ser termê mirovan li gorî baweriya şafiyan telqîn xwendine, gelek hevalên me li Stenbola xopan ketin heps û zindanan. Bi kurtasî tiştên nedîtî û nebînayî anîn serê me şêx û meşayîxan. Lê şikir ji Rebê jin û mêran; tevir û bêran re ku pêvajoyeke nû dest pê kir û hinekî germahî û nermahî çêbû. Wekî kulîlkên ku bi hatina biharê re serê xwe ji bin berfê derdixin, em bawermendên dilqewîn jî êdî dikarin serê xwe di derî û pacê re derxin derve, li hal û ehwalê dinyalixê binêrin. Bi vî awayî reng û dengê me jî tê dîtin. Aştî hêvî û daxwaza hemû mirovên qenc e, ez jî wekî mirovekî bawermend dibêjim:

*Bira ez hinareke miz bûma*
*Li dora serê te viz bûma*
*Ey aştî û ey azadî!*

Em giş ji aştiyê hez dikin, lê em ditirsin ku gurên har me ji paş ve gez bikin. Ji ber ku zilamên Roma Reş heftaqil in, bi fetlonek û teqil in, wekî mastê biçeqil in, ne jidil in, ne jidil in, wekî lîlanekê diteyisin, diçilwilin, dimilmilin.

*Gelî xwişk û biraderan*
*Ji hev re wekî dara ter bin*
*Ji xêrnexwazan re wekî pola û mermer bin*
*Nehêlin ku em tim li binî ew li ser bin*
*Her û her bi tevger û bizav û ger bin*
*Ji bo doza xwe balindeyên bibask û per bin*
*Xwedê bike, em îcar serkeftî û serwer bin*
*Amîn!*

Belkî hûn pê nizanin, lê ez Şêx Zubêrê Kurdî êdî yekî navdar û naskirî me. Van rojên hanê ji nav Weşanên Sîdarê pirtûka min a bi navê “Her Bijî Empatî, Her Bijî Sempatî” derket. Kekê Samî Tanî nivîsên min ên ku min bi rêya telepatiyê min jê re şandibûn û di rojnameya Azadiya Welat de dabûn çapkirin, berhev kirine û wekî pirtûk dane çapkirin. Kesên ku ew nivîs nexwendine divê teqez pirtûkê bistîni n û bixwînin.  Ez gotara xwe bi çend malikê ji pirtûka xwe bi dawî dikim.

**EVÎN**
*Evîn dilsoziyê dixwaze*
*Dilsozî bîrdoziyê*
*Bîrdozî berxên berkozî*
*Zêde xwe mede ber tavê berxê min*
*Dê te bisoje*
*Evîn agir e, hêtûn e*
*Çiqlê dara zeytûn e*
*Lê ew çiqil bistirî ne*
*Xwe jê bistirîne*
*Evîn hestiyê pişta dil e*
*Qîrîn û hawara bilbil e*
*Wele evîn karekî şil e*
*Sîwanek divê kurê min*

# Di mihrîcanê de xalên balkêş

Mihrîcana Fîlman a Amedê ya Navneteweyî ji bilî mihrîcaneke fîlman ew di heman demê de wekî konferansekê bû ku sînemagerên kurd ji her çar aliyên Kurdistanê û derveyî welat anîn ba hev

Rizoyê Xerzî



Li Amedê di navbera 7 û 14'ê kanûnê de 3'emîn Mihrîcana Fîlman a Amedê ya Navneteweyî hate lidarxistin. Mihrîcan bi kedeke mezin û organîzatoryeke hêja ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û saziya sînemayê Sînebîrê ve bi tevlîbûna bi dehan belgefîlm û fîlmên metrajdirêj li Navenda ÇandAmedê û salona sînemayê ya Ceylanlarê hatin pêşandan. Tiştekî din ê girîngî û cudatiya vê mihrîcana îsal ji yên berê ew bû ku cara yekem e fîlmên kurdî li salona sînemaya navendeke mezin a danûstandinê hatin nîşandan.

Ji naverok û navên fîlman bêhtir ez ê li ser hin xalên balkêş û cudahiya vê mihrîcanê ji yên berê bikim. Li gorî min xala herî girîng tevlîbûna xurt a gelê Amedê bû. Di nav wê hefteya pêşandanê de min li gelek fîlman temaşe kirin û di hemû pêşandanan de salon tijî dibûn û di ser de gelek kes li ser piyan diman an jî li ser derenceyên li kêleka kursiyan rûdiniştin.

Xaleke din a girîng ew bû ku piştî 8 salan ji navbera ku ji ber destdanîna qeyûman a li ser şaredariyan ketibû navberê dîsa bi vegera şaredariyên ji bo gel li cihê ku lê mabûn dewam kirin û mihrîcana xwe ya fîlman wekî xelatekê pêşkêşî sînemahezan bû.

Xaleke din a ji bo min balkêş bû ew bû ku dema hunerek bi qalîteyeke baş û bi organîzeyeke tekûz were amadekirin, dê bala her kesî bikişîne ser xwe û tevlêbûneke wiha xurt û bihêz bi xwe re bîne.

Min ev yek berê jî di çend çalakiyên din de dît û wê gavê jî tevlêbûna zêde bala min kişandibû. Di vê mihrîcanê de jî tevlêbûna xurt di encama qalîte û hilbijartina rast a berheman de bû.

Xala dawî jî ji bilî wan tiştên ku min gotin li ba gelê me êdî piştî 8 salan tîbûn û bêrîkirinek jî hebû ku dîsa bi dilê xwe li derdora kaniya çand û hunera bi zimanê xwe kom bibin.

Wekî din divê ez her wiha behsa çend cudabûnên din ên balkêş ên di vê mihrîcanê de bikim. Nêzîkî nîvê wan fîlman bi zimanê kurdî bûn, nêzîkî nîvê derhêneran jin bûn û tevlêbûn ji çar parçeyên Kurdistanê hebû.

Îcar ev tev li aliyekî û fîlmê ku herî zêde bandor li min kir li aliyekî; fîlmê Mano Xelîl ê bi navê Çîran ku di bi dehan mihrîcanên navdewletî de bi dehan xelat wergirtine. Ji bilî hûnandin, senaryo, dîmen û hemû aliyên teknîkî ên giranbuha, çîroka fîlm jî gelekî xîtabî hest û jiyana min dikir.

Her dîmenekî têlên sînor ên di navbera serxet û binxetê de bi dehan çîrokên ji jiyana zaroktî û ciwaniya min didan ber çavên min. Her darekî mamosteyê ereb ê baadî ku li destê xwendekarekî kurd ê ku bi erebî nizane diket kizînî bi dilê min diket û zordestiya wan mamosteyên ku di zaroktiya min de dar li serê nenûkên me dixistin wekî xewnekê ew dianîn ber çavên min.

Di temaşekirina fîlm de min jiyana xwe tev dît. Jiyana xerîbtiya li welatê xwe ku nîvê malbatê li binxetê û nîvê din li serxetê dijiya.

Film zêdeyî 2 saatan bû lê ji serî heta dawî tevî ku bi kêmanî bîranînên 15 salan ji jiyana min û kesên ji nifşê min tê de derbasbûn, lê tevî wê ez kêlîkekê jî ji temaşekirina vî fîlmî aciz nebûm. Ew 2 saatên fîlm ji bo min wekî kêlîkekê derbas bû.

**Hevnasîna sînemageran**

Bi giştî mirov dikare bêje Ji bilî festîvala fîlman ew di heman demê de bû wekî konferansekê ku sînemagerên kurd ji her aliyê Kurdistanê û derveyî welat anîn ba hev û bi hev û hunera hev dan nasîn.

Bêguman gelek fîlm û belgefîlmên din ên hêja hebûn û gelek ji wan xelat jî wergirtin lê min ev ji wan tenê fîlmek nirxandiye û dibe ku di nivîsên din de em bikaribin li ser hin fîlmên din jî nirxandinên xwe bikin û bandora wan a li ser hest û giyanê me kirine vebêjin.

## Xelatên ji bo beşa fîlmên metrajdirêj

Di fîlmên metrajdirêj de jî 6 xelat hatin dayîn. Xelata Dîmensaziya Afirîner ji Stephane Kuthy re ji bo fîlmê wî yê "Çîran" hat dayîn. Xelata Senaryoyê ya Sirri Sureyya Onder jî ji Shawkat Amîn Korkî re ji bo fîlmê wî yê bi navê "Ezmûn" hat dayîn. Xelata Kadraja Çeleng jî ji Alî Kemal Çinar re ji bo fîlmê wî yê bi navê "Beriya Şevê" hat dayîn. Bi vî awayî Çinar xelata xwe ya duyemîn wergirt. Xelata Keziyên Serhildêr jî ji Binevşa Bêrîvanê re ji bo fîlmê wê yê bi navê "The Virgin and Child" hat dayîn. Xelata Taybet a Jûriyê ji Arsalan Amîrî re ji bo fîlmê wî yê bi navê "Zalava" hat dayîn. Xelata Berxwedêr a Yilmaz Guney jî ji Kurdwîn Eyûb re ji bo fîlmê wê yê bi navê "Sonne" hat dayîn.

## Bi zimanê sembolan çîrokên tepisandî

Sînan Hezer ku hunerê weke şêweyek berxwedanê dibîne, bi zimanê sembolan çîrokên tepisandî nîşan dide.

Hunermendê kurd Sînan Hezer qala berpirsyariya temsîliyeta hunerê, pêwîstiya bi hilberîna kolektîf, şerê estetîk û polîtîkayê û hêviyê weke stratejiyekê dinirxîne. Hunerê weke bibîranîn, vegotin, berxwedan û qadeke exlaqî ya mayina bi hev re pênase dike.

Li ser berxwedana di pratîka hunerî de Sînan Hezer got, "Ji bo min berxwedan ne tenê rabûna li ber e, yan jî rexnekirin e. Berxwedan israra wê yekê ye ku ya nayê dîtin nîşan bide. Jinûvegeşkirina çîrokên tepisandî û bêdengkirî, zindîkirina hişê li ber tinekirinê ye. Di hunera min de berxwedan 'nerazîbûnek' nîne, şêweyekî dewamkirinê ye, israra li ser hebûnê ye. Dema ku firçeya xwe digerînim, dibêjim 'Ez li vir im, em li vir in, çîroka me neqediyaye' dewam dike. Dîroka gerdûnî ya hemû neteweyan bi vî rengî xurt dibe."

Sînan Hezer girîngiya sembolên di berhemên xwe de bi vî rengî vegot: "Sembol ji bo min weke 'zimanekî veşartî' ne. Tiştên ku yekser nikarim bibêjim, dema ku gotin bi rîsk be û vegotin kêm bihêle, sembol derdikevin holê. Çivîkek, bedeneke birîndar, heywanek, valahiyek, gerîlayeke jin a dimeşe... Ev hemû îşaretê bi çîrokekê, bi jiyanê dikin. Bi dîtina min hin sembol parolaya jiyana di bin zextê de ye; ji temaşevan re dibêje, 'Ya te nedîtiye bibîne, ya te ji bîr kiriye bi bîr bîne'. Her hunermendek ku hunerê hildiberîne, li pey parolayekê, li ber nirxandin, şîroveyekê dikeve. Ez jî yek ji wan im. Di hin sembolên xwe de bi zanebûn balê dikişînim ser vegotinên gelê kurd, neqşên li ser tejikan û zimanê bedenî yê kevneşop. Ev yek ne nostaljiyek e, nîşandana berdewama hebûnê ya li ser koka xwe ye."

Di berdewama axaftina xwe de Sînan Hezer nêzîkatiya hunerî ya kolektîf nirxand û wiha pêde çû: "Hunera kolektîf ji bo min ne tenê karkirina bi hev re ye. Tê wateya fikirandina bi hev re, êşa bi hev re, xurtkirina hevdu. Kolektîfî hevkariyeke berpirsyariyê ye. Ji bo hunermendên li sirgûnê yan jî di bin zextê de hunerê dikin kolektîf li dijî tenêtiyê. Ew tevneke piştevaniyê ye. Di nav vê tevnê de parvekirin, axaftin, nîqaş û bibîranîn hene."

Sînan Hezer ji bo parastin û zindîhiştina hişî wiha dawî li axaftina xwe anî: "Ne weke xemlekê weke amûreke piştevaniyê, maleke bîranînê, qadeke berxwedanê em xwedî li hunerê derdikevin. Ji kîjan welatî, ji kîjan zimanî, di nav kîjan şert û mercî de dibe bila bibe, em bibin dengê hev, soz bidin hev û mil bidin hev. Ji ber ku dema me bi hev re hilberand, bi hev re bi bîr anî, bi hev re li ber xwe da, ev çîrok dikare ji tinebûnê rizgar bibe." *AMED*

## Gelek fîlm hêjayî xelatê hatin dîtin

Gelek fîlman xelat wergirtin. Xelatên tematîk ji bo fîlmên ku di çarçoveya mihrîcanê de hatibûn nîşandan, hatin dayîn. Fîlma Jino Hadî Hesen a "Sêgoşe" Xelata Mansiyonê ya Zîlan Hemo wergirt. Xelata Taybet a Jûriyê ji bo fîlmê bi navê "Garan" ji Mahsûm Taşkin re hat dayîn. Xelata Mensûr Kerîmyan ji bo fîlmê bi navê "Kawyar" ji Salem Salavatî re hat dayîn. Piştre xelat ji bo belgefîlman hatin dayîn. Xelata Taybet a Jûriyê ji bo fîlmê bi navê "All The Mountains Give" ji Arash Raksha re hat dayîn. Xelata Taha Karîmî jî ji bo fîlmê "Xalko" ji Sami Mermer û Hind Benchekroun re hat dayîn.




## Xelatên Fona Projeyê ya Sînebîrê

Xelatên ku di çarçoveya Fona Projeyê ya Sinebîrê de hatin dayîn hatin aşkerekirin. Di beşa kurtefîlman de xelat ji Raber Îbrahîm re ji bo projeya wî ya bi navê "Tarî û Ronahî" hat dayîn. Xelata projeya belgefîlmê jî ji Zelal Sadakê re ji bo projeya wê ya bi navê "Hucre, takekes-laş, civat" hat dayîn. Di beşa fîlmên metrajdirêj de jî xelata projeyê ji bo fîlmê bi navê "Dîroka Wenda" yê Alî Kemal Çinar re hat dayîn.




## Ayşe Şan li Amedê hat bibîranîn

Bi mazûvaniya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Ma Musîc, Komeleya Çand Huner û Wêjeyê ya Jinan (KASED), Konservetuara Aram Tîgran û Komeleya Çand û Hunerê ya Dîcleyê bi munasebeta 29emîn salvegera mirina hunermenda kurd Ayşe Şanê bernameya bibîranînê li dar xist. Di çarçoveya bernameyê de lîstikvan Berfîn Zenderlîoglu lîstika bi navê "Ez Ayşe Şan" li eywana çandê ya şaredariyê lîst. Malbata Ayşe Şanê û gelek nûnerên saziyên civaka sivîl tev li bernameyê bûn ku li Eywana Çandê ya Alî Emîrî hat lidarxistin. *AMED*



## Li Qamişlo şevbihêrka kurteçîrokan

Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê şevbuhêrkek ji bo xwendina kurteçîrokên di Festîvala Çandê-Beşa Kurteçîrokan a 2yemîn de bi ser ketibûn, li Parka Xwendinê ya bajarê Qamişloyê organîze kir. Di şevbuhêrkê de hejmarek ji nivîskar, rewşenbîr û helbestvanan amade bûn û kurteçîrokên serkeftî hatin xwendin. *QAMIŞLO*



## Ji bo Pirtûkxaneya Çemçemalê kampanya

Hefteya borî ji ber barana zêde lehî rabû, 5 kesan jiyana xwe ji dest da û ziyaneke mezin da bajarokê Çemçemalê. Ji sedî 90ê pirtûk û pêdiviyên pirtûkxaneyê zirar dîtin, zêdetirî 10 hezar pirtûkên ji çavkaniyên kurdî û erebî di bin avê de man û êdî bi kêr nayên. Her wiha zêdetirî 3 hezar rojname û kovar wêran bûn. Li Silêmaniyê, Rêxistina Geşepêdanê ya Sivîl (CDO) bi hemahengiya li gel Rêxistina Şarê Wêje û Hunerê û Pirtûkxaneya Giştî ya Silêmaniyê pêngavek ji bo komkirin û bexşandina pirtûkan ji bo Pirtûkxaneya Giştî ya Çemçemalê ragihand. *AMED*




## Xelatên nivîsîna lîstikên kurdî hatin dayîn

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê 7emîn merasîma xelatdayîna Nivîsîna Lîstikên Kurdî ya Evdirehîm Rehmî Hekarî li navenda ÇandAmedê ya navçeya Bajarê Nû ya Amedê li dar xist. Beriya ku xelat bên dayîn şanoya 'Lîstika Şanoya Jîn' û 'Kokteyl' hatin lîstin. Piştre jî li eywana şanoyê kesên ku senaryoyên fîlman nivîsandibûn hatin xelatkirin. *AMED*

xwebûn

22 - 28 Kanûn 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 314

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

Ji bo abonetiyê
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Roşanê Gaxanî: Resayîşê ci yê ewroyî

| Lîzşêr AMED

Gaxan, teqwimê zazayan (kirmancan) de, hem nameyê aşma peyêne ya serre yo û hem zî nameyê yew roşanê kehan o. No roşan, xatirwaştoxê serra verêne û mizgînwanê serra newîye yo. Cografyaya zazayan de, xusûsen Dêrsim, Erzingan, Meletî, Sêwaz, Gimgim, Çewlîg û dorûverê ci de, elewîyê zazayî nê roşanî bi coş û heyecan fîraz kenê.

**Kulturê şarî yo**

Gaxan, tenya yew şayî nîyo; eynî wext de yew îbadet, yew komelbîyayîş û yew kulturê şarî yo. Goreyê bawerîye, Gaxan têkilîya mîyanê însan û tebîetî, mîyanê tarîx û ewroyî virazeno. No roşan, dinya de sey "Kalo Gaxan", "Gaxan" yan zî "Serrenewe" yeno zanayene û kokê xo şino heta demanê tewr kehananê Mezopotamya û Anatolîye.

**Kokê etimolojîk û tarîxî**

Nameyê "Gaxan"î ser o tayê teorîyê cîya-cîyayî estê. Kirmanckî de "Ga" heywanê ke zîret de xebetîyeno, yanî "Gaye" ra yeno. Tayê cigêrayoxî vanê ke Gaxan, "Roşanê Gayî" yo. Çunke demê kehanî de, heyatê însanan girêdayeyê heywanan û zîretî bî. Gaye, sembolê hêz, bereket û xebate bi.

Hetê tarîxî ra, kokê Gaxanî şino heta bawerîya Mîtraîzm û Zerdeştîye. Zerdeştîye de roşnî (roşti) û tarî (tarîtiye) hertim mîyanê şerî de yê.

Gaxan, o dem o ke şewî tewr derg ê û nê şewan ra tepîya roje bena derg, yanî roşnî serkewte bena. No roşan, serkewtişê roşnîye fîraz keno. Tirkî de cira "Rojagêrayîşê Zimistanî" (21 Kanûne) vacîyeno. Kulturê zaza-elewîyan de, no proses sey têkoşînê "Kalê Gaxanî" (Serra Kehane) û "Fatike" (Serra Newîye) yeno temsîl kerdene.

***Rituelê Gaxanî:*** Hîrê rozî rojî û şayîye

Roşanê Gaxanî, goreyê teqwimê kirmancan, hewteyê hîrêyin ê aşma Gaxanî (Kanûne) de dest pê keno. Herçiqas mintiqa bi mintiqa tayê cîyayîyî bibê zî, esasê rituelan yew o.

**Rojeyê Gaxanî**

Zafê cayan de, Gaxan bi rojeyî dest pê keno. Şarê ma hîrê rozî rojeyî gênê. No rojeyî, sey rojîyê Xizirî yan zî Muharremî giran nîyo, la semedê pakîye û hurmetê tebîetî yeno girewtene. Merdimî wazenê ke serra newîye bi zerrîyo pak û nîyeto rind dest pê bikerê.

**Şewa Gaxanî**

Roja peyêne ya rojî de, şewa Gaxanî dest pê kena. Na şewe de, keyeyî yewbînan rê şinê meymanîye, qiseyê weşî kenê, estanikan vanê û werdê taybetî virazenê.

**Şano û temsîl: Kal, Fatike û Ereb**

Gaxan de qismê tewr muhîm û tewr rengîn, kayê (şano) ke ciwanê dewe kay kenê yo. Nê kayî de hîrê karakterê esasî estê:

***(Kalo Gaxan):*** Temsîlê serra verêne keno. Yew camêrd kincanê kehanan dano xo ra, riyê xo bi komir sîya keno, yew sakalo sipî dano xo fek û yew bastonî gêno xo dest. Kal, sembolê zimistanî, pîrbîyayîşî û tecrube yo.

***Fatike (Veyve):*** Temsîlê serra newîye, bereket û ciwanîye kena. Yew ciwan kincanê cinîyan dano xo ra, xo xemilneno û beno "Fatike". Fatike, sembolê dinya, erd



Gaxan, tenya yew şayî nîyo; eynî wext de yew îbadet, yew komeldayîş û yew kulturê şarî yo. Goreyê bawerîye, Gaxan têkilîya mîyanê însan û tebîetî, mîyanê tarîx û ewroyî virazeno. No roşan, dinya de sey "Kalo Gaxan", "Gaxan" yan zî "Serrenewe" yeno zanayene û kokê xo şino heta demanê tewr kehananê Mezopotamya û Anatolîye

û zîretî ya.

**Ereb (Pasey/Mire):** Pasevanê Kalî û Fatike yo. Riyê xo sîya keno û destê xo de yew dar yan zî qamçî esto.

Wezîfeyê ey, Fatike bipawo ke kes aye nêtirawo. Ereb, temsîlê hêz û qewetê pawitişî keno.

Nê hîrê kesî û ciwanê bînî, şew de kewnê mîyanê dewe (yan zî mehla) û keye bi keye (ber bi ber) gêrenê.

Wexto ke şinê berê yew keyeyî, Kal dua keno: "Gaxanê şima bimbarek bo, serra newîye şima rê weşîye û bereket bîyaro!"

Wayîrê keyeyî zî înan rê "Şima bi xêr ameyê" vanê û xurcinê/tunik înan rê çîyê werdene (ard, riwen, qawurma, vamyê, şîrînîye, pere ûsn.) kenê.

Mîyanê kayî de, xortê dewe leqan (şaka) kenê, wazenê ke Fatike biremnê. Kal û Ereb zî aye pawenê.

No têkoşîn, şerê mîyanê zimistan û wisarî, mîyanê nêweşîye û weşîye nîşan dana.

Şar bi nê kayî hem huyeno, keyf keno hem zî dersanê cimatkîyan gêno.

**Sifreyê Gaxanî: Pêsare û Zerfet**

Kulturê Zazayan de werd/nan cayêko muhîm gêno. Gaxan de werdo tewr taybet "Zerfet" yan zî "Pêsare" (Poxîn) yo.

***Zerfet:*** Bi ard, riwenê nîweşî û sîrim (toraq) yeno viraştene. Nanê zerfetî yeno pakerdene, mîyanê ci yeno kulekerdene û riwen û sîrim tede yeno rakerdene.

***Dane (Qismet):*** Taybetîya tewr girînge a ya ke, wexto ke Zerfet yeno viraştene, yew heb "dane" (dane şinîk, pereyê hesinî yan zî yew parçeyê darî) mîyanê nanî de yeno nimitene.

Wexto ke şewa Gaxanî de keyeyî yenê pêser û Zerfet wenê, no "dane" fekê kamî ra vejîyo, a serre kismetê ey/aye do zaf bibo. O kes, a serre beno "Xalîfeyê Gaxanî" û bawerîye a ya ke Xizir a serre paştî dano ey. No adet, piştdayîşê keyeyî û cîranan xurt keno.

**Mana û felsefeyê Gaxanî**

Zaza-elewîyan de Gaxan tenya şayîya serra newîye nîyo. No roşan, yew felsefeyê "Dewrîye" yo. Têkilîya merdim û Xaliqî, merdim û tebîetî tede esta.

***Hurmetê Tebîetî;*** zazayî bawer kenê ke her çîyê tebîetî (kerrayî, darî, awe, heywanî) canê xo estê. Gaxan de merdim xo tebîetî rê nîşan dano, soz dano ke do serra newîye de tebîetî bipawa.

***Parekerdiş;*** çîyê ke şewa Gaxanî de yenê arêdayene (ard, riwen, qawurma), roja bîne yenê pakerdene. Yew qismê ci yeno poçene û cîranan rê, feqîran rê yeno dayene. Kesê ke halê xo rind nîyo, nê roşani ra fayde vînenê. Na "Lokmayê Gaxanî" ya.

***Pakîya zerrî;*** verî ke şinê serra newîye, merdimî gerek kîn û nêweşîya zerrîya xo bierzê. Kesê ke xeyîdî yê, nê roşanî de yenê aştîkerdene.

**Demo modern de Gaxan**

Sey her kulturî, Gaxan zî demê modernî de, binê tesîrê şaristanîye û koçberîye de mend.

Koçberîye, serranê 1938 û 1990î ra tepîya, xeylê zazayî cografyaya xo ra bar kerd, şîyê metropolanê Tirkîya (Stenbol, Îzmîr) û Ewropa (Almanya, Fransa). Na koçberîye bîye sebeb ke rituelê Gaxanî tayê kêmî bibê. Çunke Gaxan, esasen yew kulturê dewe û komelî bi. Apartmananê şaristananî de kerdişê "kal û fatike" zehmet bi.

***Asîmîlasyon;*** polîtîkayê asîmîlasyonî û qedexeyan ser o zî tesîr kerd. Ciwanan ziwanê xo û kulturê xo vîra kerd la belê serra 2000î ra tepîya yew "Hîşyarî" dest pê kerd.

**Bi organîzayonanê girdan firaz kenê**

Ewro, hem Dêrsim de hem zî Ewropa de, komeleyê zazayan, dezgehê kulturî û şaredarîyî bi organîzasyonanê girdan Gaxanî fîraz kenê.

Festîvalê Gaxanî yenê viraştene. Ewro Gaxan, tenya sey yew adeto dînî/tebîî nê, eynî wext de sey "nasname" yê şarê zazayî yeno dîyene. Ciwanê ke ziwanê xo nêzanê zî, bi kincanê otantîkan beşdarê nê roşanî benê û wazenê kokê xo bimusê.

**Sey yew xezîne ya Gaxan**

**Gaxan;** kultur, ziwan û bawerîya zazayan (kirmancan) de yew xezîne ya. No roşan, ma rê musneno ke ma gerek kokê xo vîra nêkerê, tebîetî rê hurmet nîşan bidê û nanê xo feqîran reyde pare bikerê.

Tarîx de "Ga" (Gaye) çiqas muhîm bîyo, ewro zî "Gaxan" semedê estbîyayîşê kulturê zazayan winayin muhîm o.

Kalê Gaxanî, her serre ma rê vano: "Serra kehane şîye, serra newîye ameye. Zerrîya xo pak bikerê, destê xo hîra bigêrê û ma û pîyê xo vîra nêkerê."

Gaxanê şima bimbarek bo! Serra newîye şima rê weşîye, aştîye û xêr bîyaro!